

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 115
Nisan
1991
Buha: 15 Skr.
3 DM

Armanc

SERXWEBÜN DEMOKRASİ SOSYALİZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 115
April
1991
Price: 15 Skr.
3 DM

Di sazûmana nû ya dinya President Bush û
Tavarîş Gorbaçov de, Kurd tenê man. Li gor alîkariya ku tê:

Kurd ne bi zikê birçî lê tê dimrin



Roja 13' ê Nîsanê di rûpela pêşî ya rojnama 'Dagens Nyheter' de - Li Swêdê rojnama rojê a herî mezin e- fotografekî mezin ê keçeye Kurd hat weşandin. Pitikeke 2-3 salî, kejeke porzêrîn, şérinek li ber dilê Kurdan... Memika wê di hustu de, di nav çamûrê de tik û tenê... Ne dê, na bav, ne qewm, ne eşir, kes li nik tunebû... Digiriya. Hêsisirên wê ji hinarikeñ wê yên sorgulî gundor bûbûn. Kes tunebû aş bike, memika wê di dev ke. Çiya, newal, dar û berên li dora wê wek vê dinya bêbext, zâlim û kêmfirsend kerr û lal bûn, nedîçûn gaziya wê; lê temaşe dikirin.

Di destpêka Adarê de ev pitika Kurd ne di nav wê gerrekê de bû. Ew, yan li Zaxo, yan jî li Dihoka rizgarkirî, li ber deriyê mala xwe ji xwe re holçık lê dikir, yan jî bi axê dîlist. Lê di 13'ê Nîsanê de, li ser axa welatê xwe, di nav lepen eskerê Tirk de êsîr bû. Di destpêka Adarê de wê nizanîbû ku serxwebûn û azadiya wê dê hewqasî kin

bajo. Mumkun e negîhand ku holçîka ku bi hevala xwe re lê dikir ji biqedîne... Belkî ne wê û hevala xwe tenê, dê û bavê wê jî texmîn nedikirin ku serxwebûn û azadî wê hewqasî zû ji mazûbantiya wan têr bibe û rû ji wan biguherîne.

Li alternatifâ xwe digere

Roja duyem a Konferansa Stockholm bû. Ji Kurdistanê xeberên kêfxweşiyê dihatin; ajansên dînyayê serê se'etê qala serkeftinê mezin ên pêşmergan dikirin. Televizyonê xebera pêşî ji Kurdistanê İraqê da, got; Kerkük jî ket destê Kurdistan. Edî her kesî qebûl dikir ku ji % 90'ê Kurdistanê hatiye rizgar-kirin.

Hevalên ji Kurdistanê İraqê dest bi vexwendinê kirin û gotin ne ew tenê, her Kurdek wê bibe xwedîyê pasaportek Kurdistanî ji.

Gurpîna dilê Kurdistan ji mîtroyekê dûr dihat bihîstin, bask tunebûn wê gavê, wê seetê pê xwe bigihi-

nin Silêmaniyê, Dihokê...Lê hîn Saddam neketibû.

Di konferansê de min bi Mahmûd Osman re hevpeyvînek çêkir. Min jê pir-sî:

- Ma tu dibêjî wê Saddam here ya na? Baweriya te ci ye?

Bîstekê fikirî, dûre bi teredut got:

- Bi raya min wê here, lê mesele wext e. Nuha ecela mîletê Kurd û mîletê Ereb heye. Çimkî yek roj ji mayina Saddam, wê müşkila me zêdetir bike. Bes mumkun e ku ecela Amerîka û ya mutefikan tunabe. Çimkî ew alternatifake li gor dilê xwe dixwazin û em jî alternatifake milî dixwazin. Amerîka û mutefîk jî dixwazin alternatifâ Seddam menfeeta wan biparîze. Îcar mumkun e bêyî ku Saddam bixînin vê alternatifê ji xwe re bibinin. Lê alternatifâ me li nik wan ne qebûl e.

Jîyanê di demek kin de gotinê M. Osman teyid kir, ku alternatifâ muxalefeta Saddam li ba Bush "ne

qebûl" e.

Cepha Kurdistana İraqê ji destpêka ser heta roja teslimbûna Saddam, li hemberî mutefikan tim siyasetek bi mesafe ajot. Di beyanê xwe de, di gavê xwe yên siyâsî de tim bi temkîn hereket kir. Bi vê

siyasetê armanc ew bû ku roja ordiya İraqê bişkê û li welêt valayî çêbibe, ew karîbin wê valayî da girin û Kurdistanê ji hêzên dijmin rizgar bikin.

Dâmahîk r. 11

Dibêjin serokên Kurdan û Saddam li ser otonomiyê li hev kirin

Dema rojnama me diket, çapê xeberek hat ku heye-teke Kurdistan -C. Talabani, S. Ebdulrehman, R. Mamed, N. Barzani- ji bo guştûgoyen otonomiyê cûne Bexdayê û tê ku gotin hukumetê û Kurdistan li ser prensibên esasi yên otonomiyê li hev kirine. Lê guftugo wê hê dewam bikin. Bingehê lihevhatinê, peymâna 11'ê Adara 1970'yan e. Her wiha hukumetê qebûl kiriye ku demokrasyek parlamenteri ya pir-partiti ava bibe, azadî ji bo çapemeniyê bê garantikirin û hilbijartînên serbest çêbîbin. Lê hê xeberên rastin nehatine. Di hejmara bê de emê xeber û lêkolinêni li ser vê bûyerê bi firehi bidin.

Rojeva Mehe

Îro ji her demê bêtir divê em hişyar bin û li ser kar bin

Pişti şikandina ordiya Seddam di şerê Xelîca Faris de, li Kurdistanâ Iraqê miletê Kurd ji heft saliyan heta heftî saliyen xwe, bi mîr û jin, sivîl û pêşmergên xwe ve serî hilda. Serîhildanek wiha mezin û bi dil û can bû ku, di navbera du heftan de % 90'ê Kurdistanâ Iraqê hat rizgar kirin, ci bigre hemû bajar ji hêzên leşkerî, polîs, BAAS'î û berpirsiyaren mayîn ên rejima Iraqî hatin paqîkirin. Miletê hêşîr, wek dêwekî rabûbû piya, zincîren hêşîriya bi salan perçê kiribûn. Di vê destpêka bîhara rengin de ji çiya, ji dol û desten Kurdistanê bi serîhildana gul û giya û kulîkan re, li seranseri welêt azadî difûriya.

Lê ew Seddamê ku bi herdu dest û piyan ve ala teslimiyetê li hember hêzên mutefikan rakiribû mal û milk û namûsa hemû welelî teslimî wan kiribû, tahamulî vê azadiya heq û pîroz nekir, êrisêk hov û har a bi çekên hewayî û sererdî, bi top û tank û çekên kîmyayî, bir ser vê azadiya fûriyayı. Armanc ne ew bû ku şerekî li dij pêşmergan li dar xe. Wî dixwest, heyfa hemû şikestin û teslimbûna Şerê Xelîcê, di şerê Miletê Kurd ê sivîl de derxe. Du sal berê hemû gundê Kurdistanê hilwesandibûn, vê carê ji armanc kavîkirina bajarê Kurdistanê

qirkirina çar milyon Kurd bû. Loma jî bajar dan ber gullê, top û tank û teyare û helikopteran. Napalm, gazen fosforik û asida sulfurik bi ser bajarê Kurdistan de bariyan. Xanî û apartman tevî nufusa ku tê de, hedimîn, hilweşîyan. Sê milyon Kurd berê xwe dan çol û çiyayen xir û xalî û bi berfîn Kurdistanê, berê xwe dan hudûdê Tirkîyê û Iranê. Xwedêwo, ci trajedî! Miletê ew qas bê kes û bê dost ku, çar alîyên wî dijmin in, ji bo ku xwe ji xezeba dijminekî xelas bike, mecbûr dibe xwe bavêje himbêza dijminekî din. Ma qedera kîjan miletî wiha ye?

Helbet yê ku tehamula serkeftina miletê Kurd a di nav du heftan de nekir, ne Seddam tenê bû. Amerîkiyan, hukumetê Rojava û Ereb jî ji vê serkeftina mezin ne-rehet bûbûn. Erê wan dixwest ku Seddam hilweşî, lê ne bi vî awayî, bi şoreşike gelêrî ku azadî û demokrasiyek rastîn bîne welêt. Wan dixwest di riya inqîlabek eskerî, generalek têkeve şûna Seddam ku ji bin emrê wan dernekeve. Ewan ne rejimeke demokrat û azad, lê yeka zeif a bin emir dixwest. Serîhildan û zafera miletê Kurd bi vê planê re li hev nedîkir. Hela Tirkîyê, pişî vê zafera mezin a miletê Kurd, cî û star ji xwe re nedidit. Tirs û lerzê ew

girtibû. Eger Kurdish bi vê serbîlîndî û xwebaweriyê heqek bi dest xistana, êdi sur simbilîn wan ne dibiri. Wê pozê wan bilind bûna, ray li wan nedibû. Dikaribûn doza Kurdistanek serbixwe, doza perçen din jî bikirana. Û hela hela ev serkeftin ji bo perçen din wê bibûna warê hêvî û baweriyek xurt.

Ji alî din Sovyet, Çin û hin weletan din ji xwe qedera xwe bi mayina Seddam, xurbûna rejima Iraqî ve girê dabûn. Ticaret xwe, çekfirotna xwe û têkiliyên xwe yên bi Iraqê re di ser her tişî re digirtin. Çavêwan ji xelaskirina Seddam pê ve tu tiş nedidit.

Loma hemû ev dewletan han razibûn ku Seddam hinekî pozê Kurdish bifirikîne. Ew hêviya ku bi Kurdish re peyda bûye, bişkîne. Ji xwe siyasetek Tirkan tim hebû ku digot: "divê ew bi xwe heqê xwe bi dest nexin, divê berê bên şikandin, paşê eger heqek hebe jî divê em bi destê xwe bidin wan." Xwiya ye gava Turgut Ozal çû Amerikayê, Bush jî li ser vê siyasetê razî kir. Bi vê armancê, tu dewletê dengê xwe li hember qirkirina gelê Kurd bilind nekir, heta mutefikan(her du rojîn pêşiyê ne tê de) rê vekirin ku Iraq teyare û Fransizan jî di vê bîryarê de rolek gîring listin û wan jî esker şand.

Lê Seddam, bêbav bû, bi pozfir-kandinê kela dilê wî sar nedibû.

Dest bi qirkirinê kir.

Hukumetê cihanî yênu ku li hêviya pozfirikandinek bûn, hew dîtin ku miletê çar milyon di navbera heftakê de dike qîr bibe, dike miletê di himbêza wan de can bide, bibe meyt. Ev jî bi xêra rojname û televizyonen cihanî, ku bi dilşewatî û dil û can dinya bombardûman kirin, hat famkîrin. Êdi, tu qîmeta nutq û peyvîn li ser rûreşîya Seddam, maf û aza-diyan milet û mirovan neman.

Tu rê li ber wan nema, ji bili

ku zû bikin alîkariya insanî bigihînin Kurden bi çolucîya keşin. Lê ji bo ku gelek dereng mabûn, êdi tu lezûbezê têr nedîkir. Rojê hezar insan dimirin, nan û xwarin û cil, derman û doktor têr nedîkir ku Kurdish xelas bike. Tirkîyê ji felaketek wiha nedipa. Wê dixwest pozê Kurdish bê firikan din û Seddam jî ji ser hukum he-re, tew Seddam dikir xwe ji Kurdish xelas bike û wan bike bela li serê Tirkîyê. Loma jî ji bo relîbergirtina vê yekê, zû bi zû na-mek ji bo NY şand ku tedbirê navnetewi bê girtin, êrisa Sed-dam bê rawestandin û imkan bê vekirin ev Kurdish penaber ên bi milyonan zûtirin wext vegeerin mal û warêna xwe.

Bush'ê ku di destpêkê de destê wî ji masigiriyê nedibû ku wextê bibîne bi rojnamevanan re pirsa

trajediya Kurdish munaqeşe bike, Bush'ê ku digot: "ev karê hundurî yê Iraqî ye, ez qebûl nakim ku eskerekî Amerikî bi tenê jî here beşdarî vî karî bibe" hat mecbûr-kirin ku bi hezaran esker bişine Kurdistanâ Iraqê. Helbet Ingiliz û Fransizan jî di vê bîryarê de rolek gîring listin û wan jî esker şand. Pişt re Hollandiyan, Belçikîyan, Almanan, İspaniyan ji bîryara

eskerşandinê girtin. Esker û alîkariya şandin dom dike. Lê alîkariya ku heta iro tê şandin, ji çerçewa insanî hê derneketiye û hê dewletan rewşa xwe li ser mesela Kurd a siyasi zelal nekirine. Tevi ku li ser alîkariya ji bo Kurdish defek hawarê iro, gurme-gurm e, dînyayê dihejîne jî, hê ji bo piştgîriyek siyasi tu ronahî vêneketiye, ji bili bîryara wezîren dervayî yê welatân Civaka Ewrûpî. Ji alî ma-newî ve qîmetek hêja ya vê bîryarê heye, lê mixabin di praktikê de hukmekî wê tune.

Di praktikê de hê ji alî tu dewletan, deriyê hêviya piştgîriyek siyasi vênebûye. Loma jî peyva Wezirê Derva yê Îsraîlê David Levy gelek rast e ku got: "alîkariya ku ji bo Kurdish tê kirin ew e ku Kurd ne birçî lê têr bimrin."

Xetera mezin hê ji ser qedera mile-tê Kurd ranebûye. Heta ji alî

siyasi ve şela dînyayê zelal û eşkere nebe ji ranabe. Ev alîkariya

insanî ya ku niha tê kirin jî di de-

mek nêzîk de dikare bê birrîn û

gelek xeteren din ji alî leşkeren Amerîka û mutefikan, ji alî plâ-

nîn dewleta Tirkîyê û ên wek wê

peyda bibin.

Dîvê em zanibin ku ev alîkariya

ku iro heye bes encama zafera roj-

name û televizyonen cihanî ye,

exlaqiyen hukumet mecbûr kirine

ku ev alîkariya bê kirin. Sedemê ex-

laqî ji dikare zû bi zû, wenda bibe

û hîn imkanen ku iro bîhnê li

miletê me yê bîtalîh didin vedan,

dikarin bi vacayî vegeerin.

Loma, nabe ku em têkevin xem-

sariyê û bîhna xwe vedin, iro ji

her demê bêtir dîvê em hişyarbin

û li ser kar bin, li ser kar bin, li

ser kar bin.

Daxuyanî

Ji ber trajediya li ser Kurdistanâ Iraqê di vê hejmara me de hin guhertin hatin kirin.

Me rüpela xwe ya 12'an jî bi tevayî da bûyeren Kurdistanâ Iraqê. Loma di vê hejmara de hûnê "Ferhenga Lîteratûrî" ya Bave Naze, "Ne karê aqila ye lê rast e" û "Hindîk Rîndîk" nebînin. Roportaja H. Mizgîn a li ser Seyaheta Sov-yetê jî me hişt jî bo hejmara ku bê. Em ji nivîskar û xwendevanen xwe doza lêborînê dîkin. Di vê hejmara de me cih nedaye quinciye "Çirok" ê ji

★ ★ ★

Niha jî xeberek xweş ji bo xwendevanen me. Em bi kîf-xweş diyar dîkin ku ji vê hejmara û pêve, S. Rêving wê redewamî di redaksiyona Armancê de kar bike. Ji xwe heta niha jî S. Rêving hema hema bi qasî endameki redaksiyonê, xizmeta Armancê dîkir. Lê çawa be ji kîfa bihevrekarkirina di redaksiyonê de cihê ye.

Loma em bîxîrhatinê didin hevalê xwe S. Rêving û ser-keftinê jê re dixwazin.

ARMANC

Leşkeren mutefîk li Kurdistanâ Iraqê

Leşker ji bo alîkariya insanî ya penaberan li herêmê ne

Bush got emê hemû alîkariya insanî ji bo penaberan bikin, wan ji êrisen ordiya Seddam biparêzin, lê em qet têkilî nav şerê çekdarî yê Iraqê nabin.

Piştî bîst rojîn trajediya 2 milion Kurdish sivil ên bi çolucîyan ketin, leşkeren Amerîka, Ingiltere û Fransayê ji bo parastina penaberan Kurdish ên sivil û bicikirina wan di kampan de, ketin nav erdêne bâkur ên Kurdistanâ Iraqê. Li gor planê wê li dor 5-6 kampen mezin ji bo Kurdish sivil bêne avakirin û ev esker wê ji parastin û karûbaren van kampan mesûl bin. Piştî çend rojan, Almanya, Hollanda, Belçika û İspaniyayê ji bîryar dan ku esker bişînîn Kurdistanê. Li dora Zaxoyê eskeran dest bi avakirina kampen penaberan kirine jî.

Serokê DYD George Bush da xwiyakirin ku şandinâ eskeran a nav Iraqê, bi her awayê xwe ve

alîkariya insanî ye, tu armanceke eskerî tuneye. Lê ger êrisek ordiya Iraqê bê ser van sivilan, wê qebûl nekin û wan biparêzin. Lê, got Bush, em texmîn nakin ku Iraq vê hebûna me ya li herêmê qebûl neke û êrisî sivilan bike. Bush got ku ne ez tenê, Françoise Mitterand, Jonh Major û Turgut Ozal jî di vê baweriyê de ne. Wî da xwiyakirin ku ew dewlet û hin dewletan Ewrûpa yên din jî di vê operasyonê de bi hev re kar dîkin.

Piştî bîryara vê operasyonê, Tirkîyê jî hînek deriyên hudûd vekirin û ji bo demek kurt bîryar da ku li nêzî Silopiyê kampeke penaberan vebe. Di vê kampê de wê 60 hezar penaber bi cih bibin.

Du profesorê Kurd:

Hebûna Milî ya Iraqê

li merivê Seddam tê parvekirin

Roza Dîlan/Diyarbelîr

Du profesorê huqûqê yên Unîversîta Erbîlê jî tevî penaberan Kurdish, di herêma gundê Derecikê yê Şemdinan re derbasî Tirkîyê bûn. Yek profesorê huqûqa navdewletan e, yê din jî yê huqûqa medenî ye. Ji tirsa merivê xwe yên ku li hundur Iraqê mane, naxwazin navên xwe bidin. Lê li ser rewşê ditinên xwe ji bo me eşkere dîkin:

-Bi hatina ser hukum a idara Seddam, demokrasi û huqûq ketin tatîlî, her peyva Seddam dikeve şûna qanûnê.

Profesoran dan diyarkirin ku hatina milî ya Iraqê li 3 milyon kesan tê mesrefkirin. Ji vê, milyonek ew kesen elît ên der û dora Seddam û kesen ku em ji wan re dibêjin caş in. Milyona duduyan, kesen istixbaratê ne ku li dînyayê gelek xurt e. Milyona dawî ew kes in yên li hundur û dervayî welêt propoganda Seddam û rejima wî dîkin.

Profesoran li ser serîhildana ku li Kurdistanâ Iraqê çêbû, weha got:

-Serîhildana Kurdish û ya din a nav welêt bi handana derva û bi taybetî bi ya Amerikayê dest pê kir. Rojîn pêşiyê bi xistina teyaran, ne raste rast be ji piştgîriyek ji bo wê hat kirin. Lê pişte re me qet fêm nekir ku mutefikan cîma riya êrisen hewayî li Iraqê vekirin. Bi qenaeta me rizgarkirina bajaran di nav du-sê rojan de ji alî xelkê û pêşmergan, mutefîk tîrsandin. Tîrsiyâku gava ew têkevin şûna Seddam wê tazmînatên şer nedin, loma rê li ber girtin.

Profesoran pê re ji got ku: "Esas dîvê bersîva vê ji serok Bush û Wezirê Derve J. Baker bê stendin". Wan her wiha dan diyarkirin ku Kurdistan bi temamî neketiye bin kontrola Iraqê, gelek cih hîn di bin desten Kurdish de ne.

Ansvarigutgivare:
Kurdiska Demokratîka
Arbetar Unionen
Postgiro: 50 37 99-9
ISSN: 0348 7385

RAMANÊN RAMANWERAN

Kiñza Xelîcê îspat kir ku hin hêzên Kurd pişti hewqas guherandinê li dinyayê hîn jî ne bi aqilêne xwe, ne li gor rastiya dinyayê, li gor qalibêne di kitêban de xwendine difikirin. Di tahlîlkirina meseleyen siyasi de jî ne wek Kurdekkî, wek "internasyonalistekî bê wela" hereket dikan, ji siyasibûnê bêtir doktrîner in. Yanî meriv bi serahat dikare bibêje ku ne ji xwe ra ne û perspektivek wan a milî hemâ hemâ tuneye. Kirîza Xelîcê ev zaafê hin hêzên Kurd bêtir eeskere kir.

Heta berî roja 17'ê Çileyê Paşîn, li derva di serî de Yaser Arafat û tevgera Filistîn, dost û hevalbendê Seddam, li Tirkîye û li Kurdistânê jî tevgerêne telebeyêne çep û çepen klasik, bi qerepereyek mezin di bin xêliya "antî-emperyalistîye" de li dijî mudaxela mutefikan derketin. Li ser navê "aşûxwazî û antî emperyalistîye" bûn piştevanêne

Bi işxala Kuwêtê re qatilê gelê me, Seddam û hêzên Xerbî hatin hember hev. Rojhilat û Rojava, yanî ew dewletên ku Seddam li Rojhilata Navîn kirin qewetek mezin, dixwazin wî bifetisînin û basko bikin. Wek Kurd, di xistin, ya ji baskokirina Seddam de béguman tu zirarek me tuneye, bîlekis, kara me heye.

Seddamê diktator ê qatil.

Hiñ hêzên Kurdistana Tirkîye jî di bin tesîra retorika Seddam û ya hevalbendê wî de man û wan jî devêne tivingêne xwe xistin sîngâ Amerika û hêzên mutefikan. Ji bo ku hêzên mutefikî erîşî ordiya Seddam nekin, bi aktifî xebitîn.

"Ev şer ne şerê me ye"

Her çigas gelek hêzên Kurd bi mesûliyeta "internasyonalî" li dijî şer beyan dan jî, lê esas hêza şeri kışand TKSP û hevalbendê wê bûn. Hevalên TKSP'ê bi rastî jî di vî warî de xebatek bê westan kirin. Di destpêkê de ji bo derneketina şer, dûre jî ji bo rawestandina wî, bi Filistîniyan re, bi hêzên aşûxwaz û bi partiyen Keskan re di bin navê "şernexwazîye" de li dijî şikandina ordiya Seddam û hilweşandina rejima wî derketin. Di hemû weşanêne xwe de, di panêlan de li ser tahlûka şer û neheqîya Amerika û mutefikan sekinîn. Li her derê ji gelî Kurd re gotin, "ev şer ne şerê me ye, divê em li dijî derkevin". Û dema şer jî dest pê kir hîn jî bi pêş de cûn, gotin "ji bo ku em wî -şer- bisckinîn, divê xebatîn hîn mezin bêne kirin".

Sekreterê TKSP'ê, Berêz Kemal Burkay di kovara Deng di hejmara 10'an de li dijî Xerbiyan gelema xwe pirr tûj kiriye, bi zimanekî şâîrane nivîsek gelek ji dil û bi şewat nivîsandiye. Bê mubalexe, gava meriv dixwîne, meriv di cî de dibe sempatîzanê Seddam. Çimkî Berêz Kemal Burkay, Xerbî kiriye gurê har û Seddam ji kiriye berxê li ber makê. Heta êrişkariya wî ji normal û xweş dibîne; dibêje, dibeku ew merivekî "megaloman", "dîn" û "diktator" be, bira yê din, dinyayê xwe bi ber teqala wî nexistâ.

Bi işxala Kuwêtê re qatilê gelê me, Seddam û hêzên Xerbî hatin hember hev. Rojhilat û Rojava, yanî ew dewletên ku Seddam li

Rojhilata Navîn kirin qewetek mezin, dixwazin wî bifetisînin û basko bikin. Wek Kurd, di xistin, ya ji baskokirina Seddam de béguman tu zirarek me tuneye, bîlekis, kara me heye. Çimkî ew ordiya ku em pê re di şer da ne û em pê nikarin, yekî din -bila ev yek dijminê me be-hatiye, dixwaze wê imha bike, ya ji hinekî ji qewet bixîne. Di rewşek wiha de ma emê çîma li dijî derkevin û bibêjin, na, lê mexe! Lê Berêz Kemal Burkay dibêje û him ji çawa?

-Xerbiyan armanc kirine ku qeweta eskerî ya Iraqê ku li hember wan radibe û ji bo menfeetên wan ên herêmî tehdîdî teşkil dike, ji navê rakin (K. Burkay, Deng, hej. 10, r. 13)

İddia ku Seddam li dij Xerbiyan e û menfeetên wan ên herêmî tehdîdî dike ji binde ne rast e, zêdetir propoganda kesen li der û dora Seddam e. Çimkî em giş dizanîn, heta 2'ê Tebaxê Seddam mutefikan wan bû û di himêza wan de mezin

Aqilê sivik barê giran

Zinarê Xamo

de ji bo ku silehan biteqînin bêsebir hereket kirin. Ji bo ku ambar-goya ekonomik tesîra xwe baş-nîşan bide, sebir nekirin. Heta davîyê zor nedan riyen diplomatik. (Deng, hej. 10, r. 9-10)

Meriv ji van gotinê K. Burkay ji têdigihîje ku mudaxela mutefikan ne bi dilê wî bûye. Yaser Arafat tişten wiha bigota, nexwesta zirar bigihîje ordiya Seddam, meriv fahm dikir. Çimkî ew ji Ereb û mutefikê Seddam e. Bê guman ewê li dijî mudaxela mutefikan derkeve û wê bixwaze ku gelş bi riyeke herî bê zirar helbibe. Lê gava serokekî Kurd ji daxwazek wiha dike meriv aqilê xwe ber dide. Yanî bi ya K. Burkay biya, divê xerbî bi salan li bende tesîra ambargoyê bimana û ne bi riyeke eskerî, bi riyeke diplomatik mesele hel bikirana. İcar Xerbî bi aqil in, tiştekî wiha nekirin, qewetâ wî li gor dilen xwe kêm kirin.

Ji xwe re kor im ji xelkê re jîr im

Ji ber ku Xerbiyan di mudaxela eskerî de ecele kirine û tawîz nedane Seddam, K. Burkay ne wek serokekî Kurd, lê wek ekspertekî kiriza Xelîcê di nivisa xwe de dijbe:

-Ev ecelekirin û tawîznedana Xerbiyan ne bê sebeb e. Armanca wan ew e ku qeweta eskerî ya Iraqê têk bibin û li hember rejimên hevalbendê Xerbî -Erebîstan Suûdi, Kuwêt û yên din- ji tahlûkebû-

Amerika hemû qeweta Seddam a eskerî imha nekir, yanî têra me Kurdan hîst. Ew ordiya ku TKSP li dijî şikandina wê bû û ji bo ku mutefik lê nexin bi aktifî xebitî, nuha bi milyonan jîn û zarokên me tazî û xwas, wek kerîyen pez dane ber xwe, ji erd û axa wan, ji welatê wan davêye der. Pişti ku bûyer gîhişt nuxteyeke trajik û felaketeke netewî, icar hevalen TKSP'ê ji bi Kurden din re diherin ber sefaretxanen mutefikan û ji wan, daxwaza alîkarî û mudaxeleuya eskerî dikan

nê derxin.

Baş e, ma Seddam bi qasî van dewletan ji me Kurdan re jî ne tahlûke ye? Lê qey ne tahlûke ye ku K. Burkay vê tahlûkê nagre ser zimanê xwe. Bira Berêz K. Burkay bibûre, lê komentaren wiha her roj di TV'a Iraqê de dihatin kirin. Tiştek gelek vekirî ye: Hebûn û qeweta Seddam a eskerî bi qasî ku ji Kurdan re tahlûkeye, ji Israel û ji Erebîstan Suûdi re ne tahlûke ye. Divê dengê bombeyen her roj bi ser Kurdistanê de dîbarin û hawar hawara zarokên Kurd, bi K. Burkay bida fahmkirin ku qeweta Seddam a eskerî ji her kesî bêtir ji me re tahlûke ye. Ji ber ku Israel, Erebîstan Suûdi û Kuwêt dewlet in, xwedîyen wan hene. Ew wek me ne bê parastin û ne bê xwedîne. Dilê Seddam kîngâ bixwaze me qir dike, Kurdistanê dişewitîne;

em "meseleyeke hundur" a Iraqêne. Lê Israîl û Erebîstan Suûdi ne "meselîn hundur" ên Iraqêne. Seddam carê bi şasî şemîti, erîşî Kuwêtê kir, xelkê pîsiyê wî pê dan xwarin.

Dostiya bi nezani

Wek tê zanîn mutefikan digotin, divê qeweta eskerî ya Saddam kêm bibe û çekên kîmyayî û fuzyeyen menzîldirêj ji bêne imhakirin. Li hember viya ji Seddam digot, çekên wiha ne di destê me tenê de hene, di destê Israîl de çekên girantir hene, divê ew ji bêne imhakirin. Ev taktik û manewraya Iraqîyan meriv fahm dike. Lê tişte meriv fahm nake, çîma K. Burkay ji şer-tîn wek ên Iraqîyan dide pêş mutefikan û daxwaza imhakirina çekên kîmyayî û fuzyeyen menzîldirêj ên Iraqê bi şer-tîn imhakirina çekên Israîl û Tirkîye ve girê dide. Di vir de meriv fahm nake armanca wî ciye?

K. Burkay dibêje:

-Qeweta Seddam a eskerî, silehîn wî yên kîmyayî, fuzyeyen wî yên menzîldirêj helbet tahlûke ne. Lê belê ev silehîn wiha li herêmî ma bes di destê wî de hene? Ya merivê ji bombeyen atomî yên Israîl re nebîbêye ci? Ya merivê ji qeweta eskerî ya tu dibê dêw ku di destê Tirkîye de ye, nebîbêye ci? (Deng, h. 10, r. 15).

Amerika û mutefik -ji bo xatirê kî dibe bila bibe- dixwazin qeweta Iraqê ya eskerî daxnîn jîr, ev ve-

çepika dixe; di TV ya Swêd de dibêje "Amerika ji li Vietnamê bi kar anî" bi vi rengi qetîlama Seddam diparêze.

Tunebûna perspektiveke netewî

Dost jî dijmin jî di praktikê de, di rojê teng de baştır tên nasîn. Vê qanûna gelemerî nîşanî me da ku tevgera Filistîn bi çavekî dos-tanî li tevgera Kurd a rizgarîxwaz nanêre, heta dijminatiya wê dike. Li Iraqê mil bi mil, bi leşkeren Seddam re erîşî gelê me dike. Li gel vê dijminatiya Filistîniyan bi tevgera gelê me re, K. Burkay, di nivîsa xwe de gava cî hatiye, berê, tim gotiye Filistîn û dûre Kurd. Heta di derekê de gava qala Konferansa Rojhilata Navîn dike, dibêje, "Lê ne bes mesela Filistîn, helbet mesela Kurd ji" (Deng, h. 10, r. 15). Di vir de diyar dibe ku mesela Filistîn li ba K. Burkay ji mesela Kurd geleki muhîmtir e. Çimkî bi gotina "helbet mesela Kurd ji" diyar dibe ku ew, dûre hatiye bîra wî û konferansa di serê wî de esas ji bo Filistîniyan e. Li gel ku rewşa me hezar qasî ji ya wan xerabir e û nufusa me ji bîst qasî ya wan e. Ma qet mumkun e ku Yaser Arafat gava qala konferanseke Rojhilata Navîn bike, bîbê; "Lê ne bes mesela Kurd, helbet mesela Filistîn ji". Bê şik Arafatê wiha nebê, çimkî berî her tişti perspektiveke wî ya netewî heye, ew siyasete ne ji bo Kurdan, lê ji bo Filistîniyan dike. Ew ne utopist û kitabî ye. Ew, li gor menfeet û kara miletê xwe, li gor rastî û şer-tîn dinyayê hereket dike. Menfeetên netewî, perspektiveke netewî, şûrek netewî tenê li ba serokên me Kurdan mefhûmîn nenas in. Li dinyayê tu tevgereke din a siyasi wek a Kurdan "internasyonalist" tuneye. Ku di rastiya jiyanê de ev idîiala paqij di destê miletên serdest de bûye sileheke xapandinê. Loma ji bi hezaran Kurd bi vê sloganê hatin xapandin, bûn "internasyonalist"; yanî nihîlistên miletê xwe. Lê her ci hîkmet e yekî Ereb, yekî Faris ya ji yekî Tirk wek Kurdan qet nebû "internasyonalist".

Bi kurtayî, divê edî em bi aqilê xwe bifikirin, bi çavê xwe bîbînîn û di pencera Kurdan re li dinyayê temaşe bikin. Gotin û prensîbîn di kîtaban de û pozîsyona dinyayê li hember vê feleketa iro bi serê me de hatiye, li hev nakin. Ger çerxa dinyayê ya siyasi li gor tahlîlîn Berêz K. Burkay bigeriya divê iro Castro nebuya hevalê Seddamê cellad û şîrîkê qetla gelê me.

Dibê Sovyet û Çin nebûna piştevanenê Seddam û li hember qirkirîna gelê me laj nemana û hwd. Di dawiyê de dikarim bibêjim, siyaseta Berêz K. Burkay dimeşîne ne li gor vê dinyayê ye, divê ew siyasete li gor vê dinyê bimeşîne.

Ji bo protestokirina qetlîama Seddam Huseyîn û nerazîbûna li ser bêdengiya cihanê

Kurdên li derveyî welêt rabûn ser piyan

S W E D : (Armanc) Bi ser pereştiya Cebha Kurdistana İraqê, Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, Komîta Swêdî ji bo Mafêrîn Kurdan, Hevkariya Partiyên Polîtik ên Kurd - piraniya partî û rîxistinê polîtik ên Kurd tê de ne-û bi însiyatîfîn piraniya Kurdên penaber, li Swêdê bi armanca alîkariya Kurdên muhacir û piştgiriya pêşmergan li Kurdistana başûr, çalakiyên cûr bi cûr hatin amadekirin.

Stokholm: Di roja 30.03.-1991'an de bi însiyatifa Cebha Kurdistana İraqê û piştgiriya Federasyona Kurdan û Komela Demokratik a Jinêne Kurdistana, li ber avahiya balyozxana Amerikayê, bi armanca birîna bêdengiya li ser rewşa Kurdistana İraqê û alîkariyê, 40 Kurdan dest bi grewa birçibûnê kir. Di rojê dujem û siyem de bi besdarbûna xort û jinêne Kurd, hejmara wan gihiş 70 kesan. Heta roja dawî, 7'ê Nisanê bi hezaran Kurdên li Stokholm û li bajarêndin Swêdê dimînin, hatin seredana wan, bi awayen cihê piştgiri û sempatiya xwe dan xuya kirin. Di dema grewê de pere ji bo Kurdên başûr hat civandin.

Di roja 03.04.1991'an de 1500 Kurd û Swêdî ji bo le'netkirina rejîma İraqê, ber bi konsolosxana İraqê ve meşîyan. Berî destpêkirina meşê û li ber deriyê konsolosxana İraqê siyaseta İraqê hat rûres kirin.

Roja 6'ê Nisanê, danê sîbê zêdetir ji 40 Kurdên li Stokholmê cûn ber avahiya konsolosxana İraqê û Seddam Huseyîn û İraq protesto kirin.

Weke ku li gelek welatêndin kîrine, li Stokholmê jî teroristên li hundir, diplomatên İraqî bi keleşînkofan gulle berdan Kurdan. Di navbera rojê 05-10.04. 1991'an de Kurdên li Swêdê bi ser pereştiya Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêd, û Cebha Kurdistana İraqê ji bo alîkariya hem-welatiyên xwe yên Kurdistana başûr û bi daxwaza alîkariyê cûn ber avahiyê balyozxanê İNGİLÎSTAN, FRENSE, AMERİKA û avahiya KOMA MILETAN. Her weha hejmareke mezin a Kurdan her di van rojan de cûn ber deriyê balyozxanê Sowyet û Kuba. Polîtika Sowyet û Kubayê bi tundî hat gunehkar kirin, ji ber ku her du welatên jî di dengdana li Koma Milatan de, di salihê İraqê de destên xwe bilind kiribûn û her du welat jî ji bo mana Seddam Huseyîn û diktatoriya wî xebitîbûn.

Di roja 06.04.1991'an de zêdetir ji 3000 Kurdên li Swêdê ji bo bîlîndkirina dengê protestoya xwe li hember siyaseta İraqê û nîsandana xemginiya xwe bo rewşa Kurdistana başûr, bi serpereştiya Komîta Swêdî ji bo Mafêrîn Kurdan, besdarî meşeke xemginiyê bûn. **Hunermendêni bi nav û deng ên Swêdî Lill Lindfors, Gosta Ekman, Sven Wollerter**, endamên Komîte, nûnerên dêrîn Swêdî û hejmareke mezin xelkê Swêdê mil bi milê Kurdan meşîyan.

Li bajarêni Uppsala, Falkoping, Eskilstuna, Sundsvall, Göteborg, bi însiyatifa komelêni Kurd ên li van bajaran û alîkariya

Kurdên li derveyî welêt rabûn ser piyan; ji bo protestokirina politika Seddam Huseyîn, nerazîbûna li ser bêdengiya cihanê û alîkariya xuşk û birayêni li ser sînoran derbeder, Kurdên li derveyî welêt, ci bigre li her welatê ku lê dijîn, rabûn ser xwe. Li gelek welatâni bi rojan li ber konsolosxana grewê birçibûnê, meşen protestoyê, kampanyayêni pere, cil, derman civandînê, bi gelêni Swêdî, Elman, Frenziz, İngiliz, Amerikan, Australyayî, Belçikayî, Hollandî û.h.d. re civin û kampanyayêni piştgiriya gelê Kurd hatin amadekirin. Çalakiyên heftiyane, mehane li welatêni Ewrûpi tev Kurdên penaber, karaker, xwendekar li dor xwe civandin. Giş bajarêni mezin ên Ewrûpayê bûn şahidê aktîvîteyên cûr bi cûr



Bîstek ji mitîngê Stockholmê. Di mitîngê de li ser navê hukumeta Swêdê wezîrê karû barê derva Sten Andersson peyivî (Foto. K. Reza)

rîxistinê demokratik û insanî ên Swêdî meş û civînên protesto, yan piştgiriye hatin amade kirin. Di roja 14.04.1991'an de Komîta Swêdî ji bo Mafêrîn Kurdan, Komela Jinan a Navnetewî, Komela Aşî û Aramîyê a Swêdî, Federasyona Kurdan li Swêdê û Komela Jinan Kurd bi besdarîya 2000 Kurd û Swêdiyan li Stokholmê, li meydana merkezi a bajêr civînek amade kirin. Ji bilî "Partiya Moderat" (Partiya Konservativ) nûnerên tev partîyên Swêdî ên di parlamento û besdarî civînê bûn; **bi navê hukumeta Swêdê, wezîrê karêni derve Sten Andersson, bi navê "Folk Partiet" (Partiya Gel) serokê partiyê Bengt Westerberg, bi navê "Vänster Partiet" (Partiya Çep) serokê Partiyê Lars Werner, bi navê "Center" (Partiya Merkezî) Per Granstedt, bi navê "Miljö Partiet" (Partiya Keskan) Ragnhild Pohanka, bi navê rîxistina Parastina Zarakan Thomas Hammarberg, bi navê Komela Aşî û Aramîyê a Swêdî Lars Angstrom** peyivîn. Di axaftinê tev besdaran de politika İraqê ya li hember Kurdan hat gunehkar kirin. Tevan da xuya kirin ku problema Kurdi li İraqê ne problemeke hundîrî ye, vajîya wê problemeke navnetewî ye û divê cihan bêdeng nemîne. Per Granstedt di peyva xwe de pir vekirî xuya kir ku çareya

esasî ji bo mesela Kurd danana Kurdistaneke serbixwe ye.

Ji 13'ê Nisanê û pê de Komîta Swêdî, Federasyona Kurdan, Komela Aşî û Aramîyê a Swêdî û Komela Jinan a Navnetewî bîryar dan ku ji bo muddeke nedîyarkirî her sembî li meydana 'Kunstredgården' bi armanca piştgiriya Kurden başûr, bicivin.

POŁONIA (Ji Warşowê Dijwar Kurd):

Di roja 05.04.-1991'an de xwendekarêni Kurd ên li Polonyayê, li dijî İraqê meşke protestoyê amade kirin. Ji parlemento û Wezareta Derve a Polonya har xwestin ku İraqê gunehkar bikin. Roja din parlamento Poloni û Wezareta Karêni Der bi beyanê cihê siyaseta İraqê ya li hember Kurdan mehkûm kir. Di beyana mehkûmkirinê de weha hatiye gotin: "Em, ji ber getlîama Kurdan, rejîma diktator a Seddam Huseyîn gunehkar dikin. Li hember kuştina gelê Kurdistana İraqê Polonya ci cara bê deng namîne. Ji bo alîkariye em bangî tev rîxistinê insanî yên Poloni û navnetewî dikin."

ELMANYA (Ji Hamburgê B. Aşîti)

Hamburg: Tagirêni Komîteya Kurdistanê - ku ji rîxistinê cihê ên siyasi û ji kesen serbixwe pêk hatiye - di roja 05.04.1991'an de avahiya Xaça Sor ji bo sa'etekî işxal kir. Ji Xaça Sor daxwaza



alîkariya pere û dermanan hat kîrin. Her weha jê hat xwestin ku heyetekê bo Kurdistana İraqê bisîne. Selehiyatdarêni Xaça Sor bo tagirêni komîte diyar kirin ku 500.000 Mark wek alîkari hatiye sandin û wê li seranseri Elman yayê kampanyayê pere û derman civandinê dest pê bikin.

Her vê rojê Kurd cûn ber avahiya balyozxana Amerikayê. Ji Amerîkiyan daxwaza bilindkirina dengê nerazîbûnê hat kirin. Beşdaran ji vir beren xwe dan balyozxana Tirkîyê a li Hamburgê û siyaseta Tirkîyê li hember penaberên Kurd û girtina sînoran protesto kirin.

Di roja 06.04.1991'an de Platforma ji parti, rîxistin û ji dêrîn Elmanê pêk hafî, Platforma hêzîn çep ên Türk û Komîta Kurdistanê, ERNK bi hev re û bi besdarîya 2500 Kurd, Elman û Tirkân, li dijî İraqê meşek amade kir.

Li bajarêni Berlin, Bonn û Osneburuk ji meş û civînên protestoyê hatin çêkirin. Her weha bi însiyatifa MEDICO INTERNATIONAL û HEVKARÊ li bajarêni Hamburg, Köln û Frankfurtê bi riya postgiro û awayen din kampanyayê pere, kînc û derman civandinê hatin vekirin.

BÜLGARISTAN: (Ji Sofyayê A. Dijwar)

SOFYA: Di roja 05.04.1991'an de 15 xwendekarêni ji her çar perçen Kurdistanê ji bo protestoya bêdengiya cihanê û Amerikayê, li

hember qirkirina gelê Kurd bo muddetê 5 rojan dest bi grewa birçibûnê kir. Her di van pênc rojan de bi armanca alîkariya Kurd penaber û protestoya siyaseta İraqê, xwendekarêni Kurd 40.000 imze berhev kirin.

İNGİLÎSTAN: (Ji Londône R. Bayram)

Di 03.04.1991'an de bi besdarîya 40 Kurdan, li dijî İraqê û bêdengiya cihanê dest bi grewa birçibûnê kir. Dîsan di 08'ê Nisanê de bo muddetê 8 sa'etan balyozxana İraqê hat işxal kirin. Belge û kaxezîn tê de hatin girtin. Di roja 08.04.1991'an de li ber avahiya Koma Miletan grewa rûniştinê hat amade kirin.

YEKİTİYA SOWYETAN (Ji Moskowayê Bawer Dilşad)

Kurdên li Sowyetê dijîn, xwendekarêni Kurd ên li Sowyetê, nûnerên rîxistinê siyasi ên Kurd, ji bo birêvebirina karûbarêni protestoyê û kampanyayê alîkari û propagandayê, di nav xwe de komîteyek saz kirin. Komîte daxuyaniyek ji bo dengê gişî ê cihanî belav kir. Di daxuyaniyê de daxwaz ji tev hukûmet, rîxistinê demokratik û ji şexsên xwedî wicdan hat kirin ku li hember trajediya Kurdan bêdeng nemînin û destê alîkariye dirêj bikin. Ji bona ku raya Wezareta Xaricî û ya Komîta

Rojnamevanê Kurd Eşref Okumuş û yê Norveçî Georg Kristianssen, çend roj piştî azadbûna Kurdistana Iraqê çün wir. Li herêmên azad li Zaxo û Dihokê gerîyan, film û foto kişandin, bi xelkê re û bi berpirsyarê şoreşê re axaftin, piştî vegerê gelek film û roportajên wan di televizyon û rojnamen ißkandinavî de derketin. Me ev hevpeyivin bi Eşref Okumuş re kir, ku em intibayen wî yê rojên azad bîghinin we xwendevanan.

Armanc: Xeyala her Kurdeki ew e ku li Kurdistaneke azad biji. Wek rojnamevanekî Kurd, demeke kurt be ji te ev Kurdistana azad dît. Tu dikarî hinekî qala wê Kurdistana azad bîk?

Eşref Okumuş: Hinek tablo tê ber çavên min ku ez dixwazim li vir wan bînim zimên. Li Zaxoyê, di hoperlorê de ilan dikirin ku wê herin pêrgî eskerên Iraqê, ji bo şer. Em bêjin ji wan re 70 pêşmerge lazim bûn, ji xwe benzîna wan ji zêde tunebû. Lî 3000 pêşmergeyî dixwestin herin. Herkesi dixwest berê ew biçe şer; cûyîna şer wek cûyîna govendê bû. Bi flandin, bi marş diçûn.

Ji bo min weke ku ez Şoreşa Oktobrê, Şoreşa Vietnamê, Şoreşa Çinê, Şoreşa Nîkaraguayê gişan di nav seetekê de bibînim. Min di umrê xwe de tu carî bawer nedikir ku xelkê Kurdistana Iraqê hewqasî bi bawerî ye, hewqasî fedekar e û hewqasî Kurd e.

Di nav pêşmergan de kesen rewşenbîr, wek doktor, abûqat, mameste, muhendîs, nivîskar pirr bûn. Serokê Yekîtiya Nivîskaran pêşmergeyekî bê rutbe bû. Li Dihokê kesen bi İngilîzî dizanibûn pirr bûn.

Dîvê ez vêya jî bibêjim, Kurdan Sûriyê alîkariyek mezin gihadîn birayêن xwe yêndi Kurd. Ew wek hêzîn li paş cephe dixebeitûn. Ji Kurdistana Tirkîyê bi pirranî tişîn dibatin.

Kurdistan 3 heftê bû ku rizgar bûbû, lê ji tu welatekî diplomatek tunebû.

Armanc: Kurdish çawa karibû di nav hefteyekê de hemû bajaren Kurdistane rizgar bikin. Ev yek bi organîzîkirina cephe bûbû ya na?

E. Okumuş: Rastiya meselê ez nizanim, ez nikarim bibêjim ku cephe berê bîryar dabû ku xelk bajaran bigre. Lî bi qasî ku min fahm kir xelkê bi xwe insiyatiyî girtibû, xelkê bi xwe bajar girtibûn. Cephe bixwesta jî nexwesta jî wê xelkê bajar bigirtana. Ji ber ku valayıyek pirr mezin hebû. Ji ber ku Muahafîzen Cumhuriyetê li jêri Iraqê bûn û bi serîhildana Şîîyan meşxûl bûn. Eskerên din ji ji sedî 99'ê wan nedixwestin şer bikin. Ez bi xwe jî bi wan eskeran re peyivîm. Bi deh hezaran teslim dibûn. Ji se-dî 90'ê wan bê şer girtibûn. Mesela li Dihokê 3000 esker hebûne, 50 pêşmergeyên PDK'ê ew girtine.

Serê sibê seet di 04'an de ji bînaya nava bajar a herî bilind, ji qata heftan bi arpîciyan, pêşî li merkeza Baasê, hefs û daîra emniyete dixin.

Armanc: Çima berê li merkeza Baasê dixin?

E. Okumuş: Min jî ev pirs ji wan kir, gotin "bi vê, tîrsa xelkê

GAVA KU KURDISTAN AZAD BÛ

"Weke ku ez Şoreşa Oktobrê, Şoreşa Vietnamê, Şoreşa Çinê gişan di nav seetekê de bibînim"



Eşref Okumuş li Dihokê di oda arşîva muxaberatê de (rismê li jor). Du pêşmergeye li ber bînaya Baasê ya Dihokê (rismê li jér)

Foto: Georg Kristianssen


dişkê û cesarete dignin". Çimkî ciyê herî bi tirs "Baas" e.

Cephe him ji alî leşkerî û him jî ji alî siyasi ve Kurdistan idare dikir. Lî bi dîtina min ji bo girtina bajaran di serî de bîryarek cephe tunejbûye.

Armanc: Pişti rizgarbûnê organîzîkirina bajaran çawa bû, Cephe kar çawa dimeşand?

E. Okumuş: Vê pîrsê meriv dikare di du xalan de analîz bike. Yek jê imkanenê maddî; mesela tunebûna derman, tunebûna benzînê, elektirîkê û ava paqî... Vê yekê tesîrek mezin li xebata wan dikir, bê guman di warê eskerî de jî. Mesela roja em ji Zaxoyê hatîn Iraqî pirr nêzî Zaxoyê bûbûn û lazim bû ku ci pêşmerge hebin, herin. Lî benzîna wan têr nedikir. Gava nîkaribin hîn li dûr in, herin pêş wan, yanî em bibêjin di şuna 10 km mesafê herin pêşîya wan, gere bipen heta 2 km. nêzîk bibin.

Çi ji destê Cephe dihat dikir. Di organîzîkirina civatê de roj bi roj ferq hebû. Roja em çûn, kaxizên benzînê jî, kaxizên kîloyek birinc jî, mesûlê Cephe yê herî bilind imze dikir. Roja din ev bêtir bi ser û ber bûbû. Lî idarekirina 3-4 milyon insan bê benzîn, bê xwarin wisa ne rehet e. Di serî de kaosek mezin hebû. Mesele, pîrekê nîv kîlo birinc kêm girtibû, hatibû dixwest ilahî bi serokê Cephe re bîpeyive. Cephe jî ji bo ku pirr demokratik bû, dihişt ku ew jinik jî tîkeve dorê û here ba serokê Cephe. Di dorê de, CNN, BBC, pêşmergeyên ku raporên bereyên şer anîbûn, ji hebûn. Pîre jî li gel wan di dorê de bû.



nereviya. Mesela, hin birîndarê napalmê hebûn, di nav xelkê de belav dikirin, digotin birîndarê gazê ne. Carna birîndarê wisa vedîşartin, lê hîn jî xerabtir dibû, xelkê digot heger ne birîndarê çekên kîmyayî ne ji bo çi vedîşerin.

Armanc: Cephe çawa dixebeitî?

E. Okumuş: Li Zaxoyê nûne-reki PDK'ê û nûnerekî Yekîtiyê li kîleka hev rûdiniştin, her tiş bi hev re idare dikirin. Li Dihokê jî wisa bû.

Ji alî çekan ve tu problem tunebû, çek wek xweliyê bûn. Lî spesiyalisten hin çekan tunebûn. Di radyoyê de gelek caran ilan dikirin, digotin spesiyalisten van çekan bila werin. Kurd, bi şev û bi roj dixebeitûn ku wan tamîr bikin. Lî Iraqîyan jî perçeyen herî muhîm jê derxistibûn, bi xwe re biribûn.

Bi tanqan ne mumkun bû ku Iraq tu carî bikaribe tîkeve nava bajaran. Tu carî ne mumkun bû ku Iraq pêşmergan bişkîne.

Armanc: Eskerên ku Cephedîl(esîr) digirtin ci bi wan dikir?

E. Okumuş: Cephê bi hezaran eskeren Iraqî girtibûn, bi kamyonan dianîn. Lî ne ew kuştin û ne jî li dereke din bi kar anîn. Dişandîn Sûriyê, digotin em teslimî Xaça Sor dikin. Tenê li Dihokê 69 kesen îstîxbaratê girtibûn ku ew jî ne îstîxbarata normal. Çimkî îstîxbarata "Ame" heye, îstîxbarata "Daxîl" heye. Ev ji îstîxbarata Daxîl bûn. Ev îstîxbarat jî direk bi Seddam ve girêdayî ye. Daîreyeka wan a xususî jî bo valakirina gundan heye. Em bi serokê ya daxîli re peyivîn. Ji me re navên gundan ku xera kiribûn, dijmartin. Xelkê dixwest ku ev derhal bêñ kuştin. Cephê nedîhîst, dixwest ew bêñ mahkemekirin.

Û NUHA!...

Heyeta Rêxistina Parastina Zarokan ji Kurdistanê vegeeria

"Me nîv seetê rapor digirt û nîv seetê jî em digiriyan"

-Adolf Tham: "Gelek birîndar hebûn... Em qet rastî birîndarên bi gulla nehatin. Wisa dihat xwanêkirin ku tev birîndarên bombeyên helikopter, balafir û topên dûravêj bûn".

Roja 19'ê Nisanê Rêxistina Parastina Zarokan a Swêdî tevî heveten xwe yên ji Kurdistanê nûvegeriyayı civînek çapemeniyê amade kir. Parastina Zarokan ji bo felaketa ku hatiye serê Kurd li cî muşahade bike 4 kes şandibûn Kurdistanâ İranê, 4 kes ji Kurdistanâ Tirkîyê. Ew li Kurdistanê 10 rojan mabûn û felaket bi çavên xwe dîtibûn.

Heyeta ku çûbû Kurdistanâ İranê, ne tenê hudûdê Kurdistanâ İran û Iraqê her wisa li İranê herêmén ku penaber lê cî bûne geriyabûn û hinek jî bi piya ber bi kûrayiya Iraqê ve çûbûn. Li gor beyanê Adolf Tham, her roj bi sedan, hezaran zarok dimirin; birçûbûnê, tûbûnê, rahtbûnê, serma hişk a şevê xelk ji taqet xistiye. Li gor ifada wî li ber deriyê hudûdê Piranşarê bi deh kilometran direjâyî rîza tîrimbelan çêbûye. A. Tham, axaftina xwe weha dom dike: "Li wan kendalan şeva xwe derbas dikirin. Ciye kî germ tunebû ku bi şev lê bisitirin. Bi şev sermake hişk hebû. Jinê ku zarok li milan îmkana hilgirtina tiştekî din tunebûn. Gelek zaro-kên piçûk hebûn ku bira an xwişkên wan ên piçûktir li milê wan bûn... Her şev zarok dimirin... Şeva ku çend zarok nemirîna, tunebû. Her sibê meriv didit ku hinek gornan dikolin ku zaro-kên şevez berê mirine veşerin. Me bi xwe didit; li kîleka rîyan goristanen nû çebûne.

İnsan giş ji qewetê ketibûn, ser çavên wan ziwa bûbûn. Kêmasiya her tiştî hebû. Av, xwarin, cil, livîn, her tişt...

"Lê tiştek hebû, vajîya rewşa li Tirkîyê bû. Muhabîf, kesen resmî yên İranî ez lê rast nehatim ku bi çavên piçûk li van însanan dîni-hîrtin. Em çûn nexweşxaneyek İranî ku li hudûdê İranê bû. Gelek birîndar lê hebûn. Laşen piraniya wan ji bombên agirî û fosforî şewitibûn. Lê gelek entresant bû, em qet rastî birîndarên bi gulla nehatin. Wusa dihat xwanêkirin ku hemû birîndarên bombayê helikopter, balafir û topên dûravêj bûn... Tu alîkari -beyî xelkê herêmê û alîkariya İranê- negîhiştibû wê derê.

Dûre kesen heyeta ku çûbûn Kurdistanâ Tirkîyê axaftin. Per Erik Aström di axaftina xwe de çeli coxrafya herêmê ya ne müsait û iklîma wê ya hişk kir. Rewşa giran a Kurdîn derbeder, tunebûna avê, xwarin û kincan kir. Ew di

-Birgitta Aberg: "Bapîr û dapîr li ber zarokan rûdiniştin û karê wan her girî bû. Her wext digiriyan. Tim qala karên xwe yê berê, tiştên ku li paş xwe hiştine dikirin. Get miacirî qebûl nedikirin.

axaftina xwe de li ser zordariya esker û burokrasiya Tirk sekînî û axaftina xwe bi van gotinan qedand: "Ew merivên ku li hudûdê Tirkîyê ne, ji bo xelas bibin, divê muhaqeç ji wan ciyan bên xwarê, li deşte bi cî bibin".

Dû Per Erik Aström, psîkolog Birgitta Åberg axivî. Wê qala psîkolojiya xelkê derbeder kir. "Zarokên di navbera 6-14 salî dixebitîn, berf tanîn, dihelandin û dikirin av. Dê malbat kontrol dikirin û wezifa zarok nihêrtinê bi cî tanân. Rewşa mera ji ya hemûya xerabîr bû. Wezifa wan ew bû dakevin jîr û nan bînîn ku vê jî hemû roja wan digirt. Lê pîri cara bê xwarin dizivîrîn, hemû awirênen malbatê li ser wan diciviya. Zarokên piçûk li dor diya xwe bûn. Kesen merivê hev ên nêzîk bûn, bi hev re rûdiniştin. Bapîr û dapîr li ber zarokan rûdiniştin û karên wan her girî bû. Her wext digiriyan. Her tim qala karê xwe, tiştên ku li pişt xwe hiştine, dikirin. Get miacirî qebûl nedikirin. Her tim qala vegerê dikirin".

Birgitta Åberg jî axaftina xwe weha qedand "Min li gel keçikek 19 salî, ku xwendevana edebiyata İngilîzî bû, hevpeyvînek çêkir. Keçikê ji min pîrsî, got: 'qet hûn li van dera rastî heyanekî hatin'. Min got: 'na'. Wê got: 'Ev donzde roj in, em li vir in. Ez bes rastî civîkekî hatim. Lê binêrin!.. Em mecbûr mane li deverên wisa dijin ku tu heyan li wan deran nikarin bijin. Emê çewa li vir bijin!'"

Ronak Reşit ji jinek Kurd bû ku bi heyetê re çûbû. Wê jî weha got: "Ez dixwazîm behsa jineke hemîle bikim ku zaroka di zik de heft mehî bû. Bi şevan di bin çadîre de di nav zilama de qet nikaribû bîhna xwe bide. Li hêviyê bû ku roj hilê, zilam derkevin der, hê nû dikaribû hinek istirehet bike. Ev jînik tevî 15 kesen din di çadirek piçûk de dima".

Di civîna çapemenî de Dr. Abdulbaqî Ehmed qala rewşa tenduristî, Huseyîn Kurdnijad jî qala pêşîgirtina leskevîn Tirk û burokrasiya Tirk kir. Di vê rûpela Armançê de hûnê pêrgî hevpeyvînen ku me bi her duyan re kiriye, bê.

Di dawîya civîna çapemeniyê de serokê rêxistina Parastina Zarokan Thomas Hammarberg axaftinek kir. Wî bi kurtî qala çalakiyên rêxistinê kir û da xuyakirin ku ji bo ku alîkariya polîtîk û insanî ji bo Kurdan bê kirin, bi hukûmetê

**Du Kurd çûn sînorê Kurdistanâ Tirkîyê
û Iraqê, felaketê bi çavên xwe dîtin**

**"Di navbera sa'et 7 û
8:15'an de, 22 mirî anîn"**

Du Kurd (Dr. Abdulbaqî Ehmed û Huseyîn Kurdnijad) 9'ê Nisanê bi heyeta Rêxistina Parastina Zarokan ya Swêdî re çûn hudûdê Kurdistanâ Tirkîyê û Iraqê. Li wir 9 rojan man û rewşa Kurdîn ku ji ber zulma Seddam derbeder bûne, li ciyê cî muşahade kirin. Ew trajediya ku bi çavê xwe dîtibûn tevî hevalen xwe yê Swêdî di civana çapemeniyê ya Parastina Zarokan de diyar kirin. Ji bo xwendevanen xwe me, piştî civinê ev pîrsen jérin ji wan kirin.

hist.

-Dema tu çûyi wê derê,
wek Kurdeki te ci his kir,
reaksiyonâ te ya pêşin ci
bû?

-Ez gelek gîriyam. Min
xelk maç dikir, wan ez maç
dikirim. Min li ber dilê
wan dida, wan li ber dilê
min dida. Rewşa wan gelek
gelek nexwes bû. Gelek ca-
ran me ji bo rewşa xwe
kelimeyên bi qiwet wek je-
nosit, wek tov qelandin bi
kar tanin. Lê belê vê carê bi
rastî jî weha ye.

Pîrs: Kak Abdulbaqî qa-
sî ez dizanim merivên te ji
di nav wan de hebûn. Dema
te ew ditin, te ci his kir ?

Dûmahîk r. 9

-Rewşa alîkariya der çawa bû?

-Pîrr kêm bû.

**-Tu alîkari ji dewletek
Musulman -Ji bili Tirkîyê
û İranê- an Ereb hat?**

-Na, me ne dit û ne ji bi-



DİYARBEKİR Dİ ŞEWA CENİYAN

Hesenî GİRAN

Vizér 8'ê Adari ('Edari), rojê cenîyan bi. Semedê inî rojî ra yew "şewi" organize bîbî. Ez zî şiya ina "şewi".

Ez ki berê teberî ra şiya cay "şewi", polîsan ez sa'naya (areme kerdâ). Hîm teber a him zî zerre di zav sexlet bi. Saloni di cay ronişti nêmendbi.

Ez şiya cay xwi resaya nêresaya spiker ame sehne, dim a yew spikeri zî amey. Yanî spikeri di tenî bî, yew keynek û yew lajek. Spiker saloni ra ewniya ki tanî cenî kişa saloni di pay ra yî, va:

-Şimazanî eyro rojê cenîyan o, ca bidî cenîyan wa cenî roşî.

Goştaritoxan cepikî kutû.

Şewi wextê xwi di dest bi programê xwi kerd. Bellî bi ki ina şewi bi disiplin a.

Verê verkan Serekê Cemiyeta Heqê Mêrdiman Xetib Dicle (Hatip Dicle) ame mîkrofoni ver, Türkî qalî kerd, va:

-Eyro ma qestê dişmenan ra ewta yî. Sariştanan, dewan û koyanê ma di eyro roj wesarê milleta ma wo. Milleta ma newe ra xwi aqiliyêna. Ayê ki koyan di mucadele kenî, him semedê milleta xwi rî him semedê şerefê mîrdimey rî xebîtê-nî. Eyro cenîye Kurdan rayîre azadî di aver (over) şonî, mucadele kenî. Hîma vizér Hezex (Idil) di Rûkiye Bozkurtî şehîd bî. A zî dekewti karwanê şehîdanê Kurdanî.

Qalanê Xetib Dicle ra pey marşâ millî ya Kurdan "Ey Reqîb" amey vatis.

Marşî ki qediyay, yew cenî amey sehne, bi Kirdasî (Kurmancî) derheqê rojê cenîyan (8'ê Adari) di me'lûmat da.

Dim a Nazdar Kahramaner amey mîkrofoni ver. Yew kaxid dest di bi, ge-ge ti ra ewniyay û erjayeya heqê cenîyan û rojê cenîyan ser o bi Kirdasî qalî kerd. Nazdarî Kahramaneri qalanê xwi miyan di va:

-Besê ya cenîya Seyîd Rizay, 1937'di koyanê Dêrsimî di mucadele kerd. Şovenan û reyeprestanê (irkçı) İraqî, Leyla Qasimi semedê mucadeleyê ja ra dar di kerdî, xeniqnay. Telebanê Üniversiteye Dicle ra Zekîye Alkan (Zekîye Alkan) a Dêrsimiji, Newroz di adir xwi ra na, xwi veşna. Eyro hînî cenî Kurdan tena temaşê nêkenî, mucadeleyê şoreshî (devrim) miyan di cayê xwi gênî. Wa 8'ê Adari cenîyan hemînî rî pîroz bo (mubarek bo)!"

Nazdarî ra pey yew cenî yew şîra Cigerxwîni wendi. Ina şîri behse cenîyanê Kurdan kerdînî.

Yewna cenî bi Türkî derheqê 8'ê Adari di qalî kerd, va:

-Cenîya Seyîd Rizay, Besê û cenîya 'Elîşerî, Zarife zî bi tifinî xwi Serehewanayışê Dêrsimî di camêrden reydi -vera hukmatî- lej kerd. Gama ki Leyla Qasimi berdi ki ja 'îdam biki, a bi xwi paşkil da sêpê (sehpâ) ro, şehîd bî. Cenî ma, eyro asar yew seviye resay ki hîni mucadeleyê çekdarî di grûban idare kenî. Cenî ma, eyro şerefî millî û

welatperwerye heme çî ra erjayeyê zanî. Mucadeleyê Kerboranî (Dargeçit) di cenîyan û gedan tena vera eskeran lej kerd. Rahîme Şeneri semedê protestokerdişê hefsîyan (hepsîyan) ra waşt ki xwi berê Belediya Diyarbekir ver di veşno.

Qalîkerdişê ina cenî ra pey yew dengbêj vejiya sehne, saza jey dest di bî. Verî yew şîra Kirdasî wendi, dim a çend hebî deyîrî Kirdasî vatî. Deyîranê jey ra yew finiyabî (erziyabî) Leyla Qasimi ser. Qalê yew deyîra jey zî yew şîra Cigerxwîni ra gîriyabî. Ay beyntar di goştaritoxan tilîli anti. Deyîra jeya peyeni, derheqê cenîyanê Kurdan ra amebi. Înî mesajî rî zav cepikî kuwyay cûka mesajê bînî yê ki ay

cenî qalî kerd (ewta inî Kurdanê multecîyan -Kurdanê Kurdistanê İraqî- hemînî ra vajîyêno "pêşmerge"). Kurda İraqî ya ki qalî kerd, problemanê Kurdanê İraqî ser o vinderti, va:

-Seddamî Kurdistanê Cenûbî (Kurdistanê İraqî) di dewe ma heme rijnay û şarî ma surgunê deşt û çolanê cenûbî İraqî kerd.

Qalanê ina Kurdi ra pey, çend mesajî amey wendiş. Înî mesajan ra yew teberê welatî ra, Komela Cenîyanê Kurdanê Şöresger-Demokratian ra amebi. Yew mesaj zî çend hefsîyanê Da'wa Kawa ra amebi. Înî mesajî rî zav cepikî kuwyay cûka mesajê bînî yê ki ay

Şîretê mi şima rî ino yo: Gedanê xwi ra mevajî "îno rayîr di meşorî." Ha laj ha keyna, ferq nêkeno, kam ki biwazo rayîrê mucadeleyê welatî di şero, têkil mebî, wa şero. Rayîrê Kurdistanî, Kurdistanî, Kurdistanî!..

Inî deyîran ra pey mesajî Şubey Cemiyeta Heqê Mêrdiman a Wan(Van)'î ame wendiş û Leyla Zana (cenîya Mehdî Zanay) amey, bi Kirdasî dest bi qalîkerdişî kerd. Labelê çend qalanê verînan dim a kaxidê xwi ra ewniyay û bi Türkî dewam kerd. Leyla Zana va:

-Eke yew welat di cenîyan zî se-re hewa na, ay welat ver bi azadî şonî û bindestey xelisêno, filîtêno. Cenîyanê Kurdan him zîndanan di him zî gerfillayan reydi bi mucadeleyê xwi vengan dawo. Cenîye ki zîndanan û mucadeleyê xwiserbiyayışê milleti di şehîd bî, eyro vîrdê ma di yî. Ma jînî xwi vîr anî û bi hurmetkarey silamanê xwi jînî rî erşawenî.

Leyla Zana nameyê cenîyanê Kurdanê şehîdbiyayan hûmarîti: 1) Berîvan (Binevş 'Egal) 2) Saniye Ürûn 3) Berîye Ya-zar 4) Saniye Hesen (Kurdanê Kurdistanê Surîye ra ya, 1989'di şehîd biya.) 5) Nafiye Öz (1987' di şehîd biya.) 6) Xanim Yaver-kaya (Hanım Yaverkaya) (1985'di şehîd biya.) 7) Rehîme Kahraman (Rahîme Kahraman) 8) Aydin Tekin (1987'di şehîd biya.) 9) Sultan Yavuz 10) Aysel Armut 11) Nurhan Demir (1988'di şehîd biya.) 12) Sakîne Kîrmîzîtas 13) Besê Anus (Besey Anus) 14) Besê (Cenîya Seyîd Rizay) 15) Leyla Qasim 16) Maşallah (Xoverdayış Sasonî di semedo ki nêwaşt bikewo destê dişmenan, xwi zinar ra vist war.) 17) 'Eysî Öcal (Ayse Öcal) 18) Rukiye Bozkurt (7. 3. 1991'di Kerboran di şehîd bî.)

Leyla Zana nameyê çend cenîyanê şehîdanê bînan zî hûmarîti ki mi nêşîna not bika, binusa. Xusûsiyetê ina şewa cenîyan ino bi ki vişaneyê (zaveya) qalîkerdo-xan, Kurdkî qalî kerd.

Kurdanê Kurdistana İraqî yê ki kampa multecîyan di yî ra zî yew

çî qerar bido ma heway şarî kenî". Dim a "kontr-gerîllay" goştarito-xanê saloni nawiti (musnay) û ti ra persay, va:

-Şima vanî se? Ma se kî inî sex-tekaran?

Goştaritoxan ra yew qîrra, va: -Jînî geber kî!

Ew çepikî kuwyay. Spikerî, çepikan ra pey Cemîle Büyükkaya (cenîya şehîd Necmettin Büyükkaya'y) da'wet kerdî mîkrofoni ver. Cemîle Büyükkaya amey û bi Türkî qalî kerd, va:

-Ez cenîya yew şehîdî ya. Di keyney mi estî, ez inka jînî miqayt kena, pil kena. Ma zav ezêt ant labelê ez iftîxar kena ki ez cenîya yew şehîdî ya.

Ja ra pey yew cenî amey yew şîra Kirdasî wendi. Şîri ki qediyay yewna cenî amey mîkrofoni ver, bi Kirdasî qalî kerd, va:

-Mi gedey xwi da fakulte ki bi-wano labelê gedey mi dekewt hefisxane. Demewo ki ez şîya veynayışê (gorüşmey) lajê xwi, eske-ran heqaretê mi kerd, nengî min û lajê mi çînay. Şîretê mi şima rî ino yo: Gedanê xwi ra mevajî "Îno rayîr di meşorî." Ha laj ha keyna, ferq nêkeno, kam ki biwazo rayîrê mucadeleyê welatî di şero, têkil mebî, wa şero. Rayîrê Kurdistanî, Kurdistanî, Kurdistanî!..

Spikerî nişka bi Zazakî qalî kerd, keyfî mi ame. Behsê şehîd 'Ezîz Turhallî (Aziz Turhallî) y kerd, va:

-Maya 'Ezîz Zaza ya la Kurmancî zî zana. Wa Zazakî xeberî bido (qalî biko) yan Kurmancî?

Bi Kurmancî persê xwi tekrar kerd, va: -Diya 'Ezîz Zaza ye lê Kurmancî jî dizane. Bila Zazakî xeber bide yan Kurmancî?

Goştaritoxan ra qorînî va "Zazakî!", qorînî zî va "Kurmancî, Kurmancî!"

Spikerî va: -Semedo ki zavane (vêşane) Kurmancî wazenî, wa Kurmancî xeberî bida.

Maya 'Ezîz Turhallî y va: -Mi lajê xwijabi wendiş, mi rî xeberî mergê jey amey. Lajê mi 'enê (goya) bînî doktor labelê semedo ki wayîrê şerefi bi û xeyretkar bi, heme çiyê xwi xelasîya milleta xwi ser o feda kerd. 'Ezîz mi ganê xwi rayîrê Kurdistanî ser na, seme-

dê welatê xwi şehîd bi. Madem ki o ino rayîr di şehîd bi, lazim o ki ez zî paşî (destek) bider da (bida bi de). Hetana ki ina mesela (mesela felatê welatî) hal bibo, ganî (lazim o ki) ma dewam bikî!

Ma heme dayka 'Ezîz rî çepikî kutû. Çepikan hima dewam kerdînî, cenîya Mehmed Tanrikulu (Mahmut Tanrikulu)'y amey mîkrofoni het, -bi Kirdasî- va:

-Mêrdey mi des serrî hefisxane di mend labelê hefis ra ki vejiya hewna zî nêvindert, mucadele kerd. Peynî di o zî dekewt karwanê şehîdan miyan. Mi meyîte (cesedê) jey nêdî, ez rehet nîya. Ayê ki mîrdîm jînî şehîd benî wa muheqqeq ci-naza xwi rî wayîr vejiyî û ja bigirî.

Înî qalan ra pey spikeri yew şîra Cigerxwîni wendi û yew dengbêja ki nameyê ja Qiymet a amey deyîrî kerdî, yew sazbendî zî dey rî sazi cenay.

Bedi yewna dengbêj ame, hetî ra saza xwi cenay, hetî ra zî deyîrî kerdî.

Deyrê jey ki qediyay, maya Cemal Aratî amey, bi Kirdasî qalî kerd.

Qalanê ja ra pey yewna skeç kay bi. Înî skeçî di behsê îspîyonkerdoxan û cahşan bînî.

Dim a mesajê Medya Güneşî, Deng, Özgür Halk û sewbî tanî mesajî amey wendiş.

Peynî di zî yew skeço bîn kay bi. Mewzûy imi skeçî "Köy Korucuları" (Kurdî vanî "qorîci") û ta'da jînî bî. Heme hîrî skeçî zî yewbînan ra weşer bî.

Ino skeç ki qediyay, yew gede ame bi Kirdasî çend deyîrî weşî vatî. Dey rî zav cepikî amey kutîş.

Peynî di ekîba kay (ekîba folklorî) vejiyay, govendi, nazo û çepikî kay kerdî.

Peynî di spikerî goştaritoxan ra va:

-Semedo ki şima heta ewta amey, ma zav sipas (teşekkûr) ke-nî. Hûmay rehetey bido.

"Şewi" bi inî qalan qediyay. Ma vejiyay teber ki vewri dest pey kerdo varena. Yew puko xidar bi ki qe mevajî.

Diyarbekir, 9. 3. 1991

ÇOLO

Arêkerdox: FIRAT

Da dayê, Çolo, Çolo, Çolo!
Çolê vêşayî persena tey olumo ucuz û qezenc o.
Xoso xoso, xoso, derd o, wax kül o!
Emegê na dîna gewre çığa tol o, bos o.

Da dayê Mezra nat o Qutî ya, mi va cadeko rast o.
Na daya ma gureto werdo, zera Comerd cora ho ra névirasto.
La lawo, na mowa min daymet gureto werdo.
Cora zerê Comerd ho ra névirasto.

Da dayê xoso, xoso, xoso, ax leminê xoso!
Emegê na dîna gewre çığa tol o, bos o!
Çerxanê Haqo talay de seyr kerê,
Seyê mi çola Xarpeti de hepis o, ez çığa cilâ ho de xos o!

Da dayê xoso, xoso, xoso, ax leminê xoso!
Emegê na dîna gewre çığa tol o, bos o!
Haqo tu cora keş rî nêdê diyayîne.
Cora mektuba ju laji mo û pîye kokim ra ama inkarkerdene.

Netewên Yekbûyi Iraq mahkûm kir

Ev cara pêsi ye ku mesela Kurd diçe Netewên Yekbûyi û di Konseya Ewlekariyê de di derheqê Kurdan de birtyarek tê girtin.

Konseya Ewlekari ya NY di 6'ê Nisanê de civiya, kîrinê rejîma Iraqê li hember xelkê sivil û li hember gelê Kurd mahkûm kir û ji bo multecîyan bityara alîkariya însanî girt. Sê welat, Kuba, Yemen û Zimbabwî li dijî bityarê ray dan, Çin û Hindistan jî ray nedan, bêdeng man. Di destpêkê de Sovyet jî li dijî derketina bityarê bû. Lî pişti ku di qerarê de guherandinê ku dixwestin da çekirin, hîn raya "Erê" da qerarê.

Qerar, pişti munaqeşeyen dûr û dirêj bi deh dengan hat qebûlkirin. Rayek tenê ji rayen pêwîst zêde bû; yanî hindik mabû qerar derne-keita.

Metnê qerarê, Fransayê hazirkiribû û tê de li gel daxwaza alîkariya însanî, daxwaza girtina tedbîr û qerarên siyasi jî dihat kîrin. Lî Sovyet û Çinê, bi iddîa ku qerar mudaxeleyî kar û barê hundurê Iraqê dike, li dijî derketibûn. Pişti munaqeşeyen dûr û dirêj, di qerarê de li gor daxwaza Sovyetê guherandin hat kîrin. Romanyayê

jî di qerarê de itirazî hebûna navê "Kurd" dikir. Ji ber vê itiraza Romanyayê jî qerar hineki din jî bi derengi ket.

Metnê hat qebûlkirin ev e:

"Kîrinê Iraqê yên di van demen dawî de, bi taybetî jî yên li herêmîn ku Kurd lê pirr in û li herêmîn din, li hember xelkê sivil, ewlekariya mintiqê û aştiya navnetewî tehdît dikin. Konseya Ewlekari vê şela Iraqê mahkûm dike."

-Divê Iraq tavilê dev ji van kîrinê xwe berde û li ser esasê hûmetâ ji mafê însanî û huriyetên siyasi, bi hemwelatiyên Iraqê re têkeve diyalogê.

-Divê Iraq gavek berî gavekê rê bide şandina alîkariyên rêxistinên navnetewî ku ji kesen muhtac re dişinîn û ji bo biserketina vê operasyonê divê Iraq tiştîn pêwîst bi cî bîne.

-Konseya Ewlekari, ji Sekreterê Giştî daxwaz dike ku, divê ew hewlidanê xwe yên li ser meselên însanî li Iraqê bidomîne û li ser

nuffusa Kurdan ku ji alî hêzên Iraqê ve tê pelçiqandin û mecbûri koçkîrinê dîbin û bi taybetî jî di derheqê rewşa Bakurê Iraqê de raporekê hazır bike. Li aliyê din pêwîst be divê heyetekê jî bişîne herêmî.

-Konseya Ewlekari, ji Sekreterê Giştî dixwaze ku divê ew bi hemû imkanen di bin desfî xwe de-hemû rêxistinên NY ên alaqadarı vê meselê - ji bo hewcedariyên acîl ên multecîyan û nufusa ku ji ciyên xwe bûye, seferber bike.

-Gazî hemû dewletên endam û muesesên însanî dike; divê, ew bibin piştevanen vê alîkariya însanî.

Iraq gelekî xebîti ku qerarek wiha jî dernekeve. Lî tu netice bi dest nestix û di dawiyê de qerar protesto kir, got, "ev mudaxeleya karê me yê hundur e".

Ev cara pêsi ye ku mesela Kurd diçe Netewên Yekbûyi û di Konseya Ewlekariyê de qerarek li ser tê girtin.

"Di navbera sa'et 7 û 8:15'an de, 22 mirî anîn"

Destpêk r.7

Abdulbaqî Ehmed: Malûm e, dema meriv xelkê di wê rezaletê de dibîne, herçend hemû merivên mirovî ne, bes dema di rezaleteka wisa de mirov xwişka xwe an birê xwe dibîne, dilê meriv pirr dişewite. Ji aliyeke ve xweş bû ku min ew dîtin; hemû selamet bûn. Ji aliyeke ve jî pirr nexweş bû ku meriv nikaribû ku di wî halê ne xweş de, çareyeke bas bibîne.

Pirs: Tu dikarî qala rewşa tenduristî ya Kurdên Iraqê biki?

Abdulbaqî Ehmed: Rewşa tenduristî ya Kurdên ku hatine hudû-dê Tirkîyê ku min dît, gelek xerab bû. Me 4 kamp dîtin. Kam-pa herfî mezin Bilov (İşkîveren) e ku 300. 000 penaber lê dimîn. Li wir %90'ê xelkê işhal in, di vereşin. Hinek ji wan bi tayê ketine. Zarokên wan gelek dimrin. Roja ez çûme wir, şevekê ez li nav kampa wan razam. Dema serê sibê rabûm, di navbera sa'et 7 û 8'a çariyek buhûrî de 22 mirî anîn. Ciyek hebû wek goristan bi kar danîn, li wê derê veşartin. Duyûye wan mezin bûn, yên mayî biçûk bûn. Jinê ku hemfîle bûn; zarok ji ber diçûn. Problema wan gelek giran bû. Ji hemuya ne-xweşîr av tune bû. Ava hebû jî ava rûbarî bû, ava pîs bû. Kampa ku lê kanî -li kampekê tenê û ew jî yet kanî bû-hebû, rewşa wan baştır bû. İnsan tev li ba hev in. Tu tuwalet tunene. Ci bêje ciyê destavê, erdê ku lê rûdinêñ û ciyê zarok lê ne, nan dixun, yek der e.

-Li kampênu ku tu lê ge-riyî, ci doktor an kadirêndi-

tenduristiyê hebûn?

-Belê hebûn. Lê...

-Tirk bûn yan jî ji Kur-

dên penaber bixwe bûn?

-Ji 4 kampênu ku lê geriyam, doktorê 3 kampan yê penaberan bi xwe bûn. Di nav xelkê de doktor hebûn, kadirêni sihî hebûn. Wekî din jî doktorêni biyanî hebûn. Lî bes min bi tenê doktorekî Tirk dît. Ew jî doktorekî eskerî bû. Ciyê ku li nexweşâ dinêrî, li dervayî kampê bû. Gelek zehmet bû ku nexweş biçûna cem wî. Lî wî jî çadira xwe vekiribû. Car car xelk qebûl dikir.

Rêxistîneke Fransî li wir bû; ji wan re dibêjin "Doktorêni bê sînor". Ew gelek aktif bûn. Di du kampan de konê xwe vegirtibûn û diçûn kampê din jî.

-**Gelo Tirkân rê didan ku** nexweşen giran û muhtaci ameliyatê bûn, bêne vî ali sinor û biçin nexweşanen mezin?

-Gelek zehmet bû. Pirr zehmet bû. Çunkî kontrola eskerî gelek hebû. Hindek ji wan hebûn, pişti zahmetiyek mezin digihîştin nexweşanen. Mesela li nexweşanen Cizîrê 12 nexweşen me hebûn; 6'ê wan jin bûn. Pişti izna qeymeqam, mudûrê nexweşanen û ya doktor, min fîrsend dît ku ez wan bibînim. Li nexweşanen Şer-nexê nexweşen me pirr bûn. Lî ev nexweş ne bi riya dewletê, pîraniya wan bi alîkariya xelkêna bajar û gundûn Kurdistana Tirkîyê digihîştin nexweşanen. Xelkê Kurdistana Tirkîyê gelek alîkari dikir.

-Çûn û hatina we çawa bû. We dikaribû hûn ser-best bigerin. Tirkân tu zehmetî derdixistin?

-Ji bo me gelek zehmet nîn bû. Di destê me de kaxîzen "Kızılay" ê hebûn û me kaxîze diplomatîk ji

sefareta Swêdî wergirtibû. Me dikaribû em bigerin û karê xwe bikin.

-Tu li ser navê Komela Doktorêni Kurd li Swêd çû-yi wir?

-Na, ez ser li navê rêxistina "Parastina Zarakan a Swêdî" çûm. Lî me ji Komela Doktoran bîyaryar da ku ez biçim.

-Wek Komela Doktorâ ji bo vê bûyerê ci haziriyen we hene?

Dema vê problema Kurdistana Iraqê dest pê kir, me navê doktorêni ku dixwazin biçin kar bikin, nîvîsandin. Em nuha amade ne, ku çend doktorêni me biçin nav Kurdistanê, li nav kampa kar bikin. Ez duh zivirîm, loma ez baş nîzanim wê hefteya bê kî here nav kampa. Lî ez wusa bawer dikim ku bi kêmâni 2 doktorêni me wê herin. Doktorekî me i din jî bi delegasyona ku çûye Iranê re çûye û hê jî venegeriyaye. Me wek kom-ele xwe amade kiriye ku em kar bikin. Bi riya Xaça Sor an rêxistina Parastina Zarakan bibe, baş dibe, heger bi riya wan nebe ji eme ji xwe re rîkê bibînin.

Pirs: Kak Huseyîn xwes-tina penaberan ci bû? Wan jî bo dahatuya xwe ci di-got?

Huseyîn Kurdnijad: Xwes-tina hemû penaberan yek bû. Wan digot em gişt li vir dimrin. Bes gelek ne xweş e. Hiç insanek ni-kare weha biji. Ew dibîn heta Seddam hebe, em venagerin wela-te xwe. Heger parastina me hebe û xetera Seddam li ser me tunebe, em naçin tu derê, eme herin wela-te xwe.

M. Bextiyar

Konsolosxane yan koxikên terorîstan?

Careke din "diplomatîn" Iraqî ên li konsolosxane û li balyozxa-nen Iraqê; teroristên tedrisbirî, ji avahiyen konsolosxanan berê lûleyen cekêne xwe dan Kurdan. Wek tê zanîn, li gelek welatên Ewrûpi diplomatîn Iraqê bi tenê bi karê kuştina Kurd û Erebêni li dijî rejîmê, radibin, weke ku du cara li Swêdê ji dengê giştî re xuya bû, bi polisê van welatân re ji bo casusiyâ li ser Kurdan û rêxistin-nen Kurdan dixebitin. Li dijî tev qanûnen navnetewî û Peymana Wiyana - ku dibêje diplomatîn welatân wê li gor qanûnen welatê ku lê dimînîn silêhan hilgirin û nikarin silêhan otomatîk li konsolosx-anan veşerîn, yan ruxseta wan bigrin - diplomatîn Iraqê li Stokholm, Stenbol, Helsinkî û li Moskowayê bi keleşînkofan Kurdên ku ji bo protestoyê hatine ber deriyen konsolosxane û balyozzanen Iraqê, gullebaran kîrin;

Stokholm: 06.04.1991

Dema ku nêzî 50 Kurdi çûn ber avahiyâ konsolosxana Iraqê li Stokholmê, diplomatîn Iraqî bi keleşînkofan gulle berdan Kurdan. Hükümeta Swêdê pir bi tundi bûyer gunehkar kir û ji nûnerê Iraqê Mihemed Seid el Hanî xwest ku navê diplomatîn ku li dijî Kurdan çek bi kar anine, diyar bikin. Mihemed Seid el Hanî sîsor, tevi ku nedixwest jî, lê hat mecbûrkirin ku navê diplomatî terorist Fazil S. Hesen bide. Di 11'ê Nisanê de ev diplomatê han ji Swêdê hat derxistin.

PRAG: 04.04.1991

Dema ku 60 xwendevanen Kurd çûn ber balyozxana Iraqê, diplomatîn Iraqê bi keleşînkof û debancan gulle berdan Kurdan. Diplomatî Iraqî ji Çekoslovakayayê hat derxistin.

Stenbol: 04.04.1991

Turkmenen Iraqî ên li dijî Saddam Huseyîn, ji bo protestoyê çûn ber balyozxana Iraqê li Stenbolê. Lî hundîrê balyozxanê bi çekên otomatîk, xelk hat gullebaran kîrin. Du hatin kuştin û du kes ji birîndar bûn.

HELSINKI: 05.04.1991

Diplomatîn Iraqî ên li balyozxana Helsinkiyê gulle berdan Kurden ku ji bo protestoyê çûne ber avahiyê. Diplomatî ji Finlandiya hhat derxistin.

TERORISTÊN KUBAYÊ

Ji bili diplomatîn terorist ên Iraqî, teroristên Kubayê ên li balyozzanen bajarê Bonn û Moskowayê ji bi çekên otomatîk gulle berdan Kurden ku ji bo protestokirina siyaseta Kubayê çûne ber balyozzanen wan. Telewizyon û rojnameyên Kubayê, ne qala siyaseta hukümeta xwe ku bi piştigiriya Saddam Huseyîn û Iraqê bûye şırka kuştina bi dehhezzaran Kurd û derbederbûna du milyon Kurdan, kîrin û ne jî li ser rewşa Kurdan gotinek weşandin, lê buyeren balyozxanenji mîletê xwe re wiha nişan dan: "Nûkeren Amerikayê êrisin anîne ser balyozzanen me, li Bonn û Moskowayê û êrisen wan hatine şikandin."

Kurdên li derveyî...

Merkezi a Partiya Komunist bête eskere kîrin, komîtê xwest ku bi karmendê Wezareta Xaricî û yên Partiya Komunist re biyeyivin. Her weha heyeta Kurdan bi Komîta Piştigiriya Gelên Asya û Efrîqa, Komîta Aştiyê û bi Komîta Jinan re li ser vê yekê rûniştin. Tevi "nermiya" beyana gunehkarkirinê, Wezareta Xaricî û Partiya Komunist bêdeng neman û soza alîkariya insanî dan. Di 10.-04.-1991'an de li lokala Komîta Aştiyê, civîne çapemeniyê bo rojname, radio û telewizyonâ Sowyetî hat çekirin. Di civîne de li ser rewşa dawî a Kurdistana başûr û ya gelê Kurd hat peyivin. Telewizyonâ Sowyetî civîn nişan da.

Komîteye Kurdan nameyên cihê ji bo Konseya Ewlekî ya Koma Miletan û ji bo sekreterê Koma Miletan şandin û daxwaz ji wan kirin ku mesela Kurd têxin rojeva civînen xwe û çareyan jê re bigerin. Nameyeke vekiri ji Mixâil Gorbaçov, Borîs Jeltsin, û ji ser okê Parlementoya Sowyetî Lukyanof re hate şandin û daxwaza bêdeng nemanê ji wan hat kirin. Komîtê, li Koma Miletan, li ser mewqufî li dijî Kurdan, nameyên protestoyê ji hukûmeten Kuba, Çin, Hindistan, Zimbabwe re şandin.

Tevi ku grew, xwepêşandan, meş û civîn li seranserî Yekitiya Sowyet hatibûn qedexe kîrin jî, ji Serokê berê ê Hükümeta Awustraliyayê MALCOM FROSOR bixwe ji bo alîkariya Kurden penaber kampanyeke alîkariyê vekiriye û her weha serokwezirê niha soz daye ku mesela Kurd bîbin Koma Miletan.

S. Rêving

DÎYARBEKİR Dİ SERNEWÊ Û TESİRÊ CENGÊ KUWEYTÎ (III)

Hesenî GİRAN

Şoforo Şinasî hewna àme mi
heti û va:

-Ez ina ray şona Fakulte yena,
ez serey mîrdimî panc hinzarî ra
şîma bena heta Erqenî.

Qifley hewt tenano ki ma heti
bi, şoforî ra pey deyax nêkerd, pilê
jînî yewna şoforî di bazar kerd, se-
rey mîrdimî panc hezarî (hinzarî)
ser o pê amey. Herkesî gala (hucû-
mê) mînîbusi kerd, ma mînîbusi
wenîşî, ca te de nêmend. Qorî pay
ra vindertişî rî zî razî bî, amey ki
wenîşî. Şofor zî çimveyşan bi,
waştîni ki hima tanîna wenîşî la-
belê hinî ca çinibi. Berê mînîbusi
zorî reydi padiya, mînîbusi hereket
kerd.

Ma seyrantepe ra, Silbi ra, Fab-
rıqa Lay (İplik Fabrikası) ra, De-
vegêçî (Deve Geçidi) ra, Zorkoy ra
viyartî, dekewtî Deşta Gewran, ver
bi Erqenî şî. Ez ewniyaya 'erebey
ki cor di, heta Erqenî ra ameynî,
veng û vart bî; ayê ki ver bi qeyme
(qayme) şînî, heway mînibusa ma
gillî ra, piir dekerde bî.

Ma ki Erqenî resay, çarşî di şarê Erqenî vindert rik ma ra û 'erebanê kîp dekerdan ra ewniya. Ayê ki ma ra ewniyaynî, bi ma hiwaynî û peşmiriyaynî. Bellî bi ki henekê xwi bi ma kerdînî.

Erqenî di ma mînibusi ra robî û ma û rayananê bînan pê ra xatir waşt. Ez û gedey xwi û cenîya xwi ma şî cay otobusa Pîranî. Ma şî ki otobusi kena ki ray mano, ma lezi kerd û bi de (bere) resay. Mi cenîya xwi û gedey xwi otobusi wenay, otobusi şî, ez tepe (apey) agey-rayâ.

Êrewo teng bi. Ez şiya cawo ki 'erebek Dîyarbekir wardenî. Îna ray mînîbusa Diyarbekir di ca zav bi, rayanî (rêwî) çinibî. Ma panc hebî miştîrî tena bî. Ma des-pancês de-qîqey pawit, sewbî miştîrî nêveji-yay, mînîbusi ma panc tenan reydi

SEYİD UŞEN

De bira, de bira
İmam Uşenê m' de bira.
Ez qurvanê bejna to wî
İmam Uşenê m' de bira.
Esker, imam Uşenê ma sare birno
De bira, de bira.
Derdê İmam Uşen ra
Kemer û dar-ber veseno.

Daye se kero, kile se kero?
İmam Uşenê mü, cade yeno ko ra
Maye qedayê lazê je to bijêro, biko,
Ez vanû, hiris u sevkane na
Bejna rindekena to ra.

Lazē carnerdū û ciwanikū
Qanùnē na dina ra
Dayē, tim ra mirenē.
İlam dest guretene, lingi guretene
Lingi guretene,
Kardi ontene

Se kero, daye se kero?
Cade yeno, cadeode şen o,
Derdé İmam Uşen mi ré
Kemer ü dar-beré Haqı veseno.

Ez şune ke
Silemanê Xinciki
Qaymeqam ver de nişte ro
Zemon sürü moreno.

Mi va ke belka gonî qeyretane
Kureslijenî keno.
Cigera mi zalimû dest a
Eve wesenî cêno.

Mi nézona ke Silémané Xinciki
Kuresijeni xo vir a kerda.
Dismenéna kane arda xo víri,
Şirsa xo, xo ver de hëdi hëdi
sone keno*.

* Biewni: Haydar İşık, Dersimli Memik Ağa, Belge Yayınları, İstanbul, 1990, riperr: 54-56, 78

DERSİM RA

arêkerdox: Kerem DÊRSİMÎJ

ALÊ QERÍ

Alê Qerî waxtê xo de dizdode fena beno. Rozê sono ke mal bitirro b'aro. Pesewe sono ke cîniye be mordemek ra cayê xo serê bonî de fișto ra çêfê xo de nadanê, nêsonê hewn ra. Al hata sodir pîne, bese nêkeno ke tawa bitiro, cêreno ya, eno. Roza bîne onca sono ke cîniye be camerdi ra onca nêsonê hewn ra. Beno sodir, Al cêreno ya, eno. Roza hîrine onca sono ke onca nêsonê hewn ra. Uşîrade terne vezeno, vejino serê bonî, orxan ser de cêno, sane-
no be uşîron ver, vano :

-Lazê xojî! Hîrê rojî yo ke ez robatê to ra bêhewn o, tu çayê nêsona hewn ra?

Rind ke dano puro, cilon ci ra cêno eno.

Ferhengekē Kelîmanê Dêrsimî

ap: dat, ded
arê: ayre
b'ariye: bitehermi, bita'ni
b'aro: biyaro, beero
band: kaset
be: bi, ve
bese nêkeno: nêşino, nêşkeno
bez: beji, çiyo bêaw
hêgao bez: hêgawo beji
bitiro: bitirawo
biya: biyari, beri (beerî)
bî ra: bî, bî
bojî: boju, bazi, bazû
bover: o ver, oci, dot, dopol
ca: cili, cile, nevin, livini
cêno: gêno
cêreno ya: agêreno, agey-reno, racêreno
cinayîne: cenayış
ciniye: ceni, cini
ci ra: ti ra
Comerd: [tekst di] Hûmay, Homa, Ella, Alla (**Zera Comerd cora ho ra nêvirasto:** Zera Hûmay caran xwi ra weş nêkerda)
cora: caran, ci ray, binçaran, bin ra, bin di
çakut: çakuç
çayê: ci rê, ci ri, çinay rê, çina ra, ci semed ra, qey, qê?
çem: ro, rû, robar
çerxane (çerx): çerx, dewran
çef: keyf, këf
çığa: çiqas, çendi, ci hendi?
çira: çila, çiley
çî: zî, jî, kî
çole: çale, çali
daya ma: dadîya mi, maya ma, mowa ma
daymet: timi, timo, daîma
de: di, dir, der
deyra: derya, dengiz, behr, bahr
diyayîne: diyayış, deyiş; vînayış, veynayış
dîlege: waştîş (Türkî di: dilek)
eno: êno, hêno, yeno
erê: herê
fişto ra: ravisto, rakerdo
girs: gird, xişin, pil
guretene: girewtîş, gurotiş
gurêna: xebitna
guriyêne: girweyayê, xebitiyayî, şuxuliyayî
Haqo tala: Heq te'ala, Homa te'ala, Hûmay te'ala, Ella te'ala
hata: heta, heya
henî: indi, hendi, ehendi
hepis: hefs
herediyayîne: celiyayış, cigriyayış, hêrs biyayış
heval: hembaz, embaz, imbaz, 'emaz, enbaz, inbaz, 'imaz, ombaz
ho: xo, xwi, xwu, xwe, xu
hona: hewna, hima, hema, deha
înkar kerdene: înkar kerdiş
isan: insan, inson, mërdim, merdum, mordem
ju: yew, yo, jew, zew, zu
jûvînî: yewbinan, yewnan, yohînî, yemna, yewmîn

jewbîna, jûbînî, jumin, jîbanan, zewmbînî
ke: ki, ku, gi
keş: kes
kewran: karwan, karwon, karban
kokim: pîr, kal
kundir: kuy, kû, kuwî
laj: lac, laz, law, layik
laz: b. laj
le: lêñ
lewa teke: leya teki, yewley
lewê...: ... heti
mektube: mektub
mezele: tirbi, qebri
mêw-e: lem-i, lemeki
mo: moe, may, mari, dadi, day (mowa min: maya mi, dadiya mi, daya mi)
mordemek: mërdék, mërik
na: nê, nî, enî, ini (naye: nay, enay, inay)
nacar: kureçî
nadanê: ewnêñê, hewnêni
nanêñ: wina, inawa, inasar
nat: naşt, na heta, ina heta
nî: nê, inî, enî, enê
olum: merg, merdiş (Türkî di: ölüm)
onça: ancî, anciya, ancina, hewna, rayna, gilana, fina
orxan: leheyf, liheyf, lihêf
pî: pér, bawk, baw, babî, ba, bu
pîne: paweno
qilba: qible, qelbi
rast: raşt
raver: verî, aver, over
roze: roj
saneno: şaneno
sare: sere
sate: se'eti
selam: silam
sey: seyek, sekur
seyr kerdene: ewnîriyayış, ewnîyiş, hewnîyiş, temashe kerdiş
seytan: şeytan, seyton, seyto, seytû
sima: şima
sodir: serê sibay, şefaq, şewdir, nimaci, nimâji
son: şan, şon, san
sonê: şonê, şinê
tawa: teba, ci
taye: tanî, tonî, tay, toy, tuy
tey: te de, miyan di
tol: veng
tu: 1)to, 2)ti
tu nêsona hewn ra: ti hewn a nêsoni, ti xwi di nêsoni, ti nêbusenî
ucuz (ucij): erjan, ercan, arcon (Türkî di: ucuz)
üşire: şewti, seyti, şoti, şiv
fü: o, we; aw, ay
vezeno: vejeno, veceno
vêra son o: vera şanî yo
vêsaye: veşaye, veşate
virastene: viraştiş
virende: verî, vernî di
vinayîne: vînayış, veýnayış
Xarpêt: Xalpêt, El'ezîz
xoj: xoz
ya: e, belê
zerê mi: zera mi, zerîya mi, waşa mi

Dewleta Tirk rē li ber alîkariya xelkê digre

**Roza Dilan
(Diyarbekir)**

Xelkê Kurdistana Tirkîyê dest bi seferberiyek mezin kiriye. Tevi ku feqîrî û belen-gaziyek mezin di nav wan bi xwe de heye jî, lê ji bona ku alîkariyê bigihînin penaberên Kurdistana Iraqê, ci ji destê wan tê, dîkin. Ji her bajar, qeza û gun-dî û ji her malê, alîkari tê komkirin. Li gor rojnamevan û nû-cegihanen cihane, li gor kesen ku diçin herêmê bi xwe jî, heta iro ji sedi 90'ê alîkariya ku gîhaştiye penaberan ji ali xelkê ve hatiye.

Lê berpirsiyar, esker û "milisên gund" yên dewleta Tirk rê li ber vê alîkariyê digrin, nahêlin xelk xwe bigihînin penaberan. Loma ji beşeki gelek hindik ê vê alîkariya ku hatiye komkirin, digihije penaberan. Li

Sernexê alîkariya ku kom dibe li qereqolan tê stokkirin. Tevi ku penaber ji birçina û sermayê qir dîbin jî, xwarin, kinc û bataniye di depoyen dewletê de dirizin.

Jin û zarokên li wi alîyê çemê Hizile ji bo ji birçina nemirin, giya û pincarê dixwin. Gundiyen Silopiyê di-xwazin xwarin û kin-can bigihînin wan. Lî milazimeki Tirk tevi eskeren xwe nahêle û loma ji alîkari nagîhê wan. Li kampa Işikverenê ya Uluderê ji eskeren riya alîkariyê girtine. Esker bi qundaxen silehan û bi gulan her du alîyan ji hev dûr dixin. Di netica erîsek wiha de me carekê bi çavê xwe dit ku çiqas dexil û dan, birinc û erzaq rijiya erdê.

Tevi vê rîlibergirtinê, ciyên ku me xwe gîhandê, em rasti tu alîkariyek dewletê ji

nehatin. Kurdên Kurdistana Tirkîyê li hember vê rewşê di infialek mezin de ne, diqîrin, dibêjin; alîkariya tu kesê ne lazim e, bila rê li me negirin, em amade ne ku hemû lazimiyen penaberan temin bikin.


Talana "Milisên Cans"

Talana wan milisên ku ji bo parastina hudûd hatine tayinkirin, gîhaştiye hedda dawiyê. Nanekî bi dinarekê (8.000 L.T.), klaşinkofekê bi 10-15.000, yan ji bi du sênanan difiroşin penaberên birçi û jihalketi. Hinek jinên penaber diyar dîkin ku ji devla firek avê, zérê wan ji wan tê stendin. Penaberên Kurd terki bênsafî û bênsaniya leşkeren Tirk û cahsen milis búne.



Xaçepirs

Amadekar: S. Rêving



ÇEPERAST: 1: a- Pay-textê Komara Kurdî a sala 1945 li Kurdistana Rojhîlat. b- Paşnavê feylesof û helbestvanê Kurd, nivîskarê destana "Mem û Zîn". 2: a- Belê, e. b- Cihê ku mirov, heywan, tirimbîl li ser diçin (berevajî) c- dengvedan, ekis. 3: a- Peyveke pirsê. b- Ji şûrén zirav, tenik û dirêj re tê gotin (berevajî) c- mih (berevajî) 4: a- Giş, tev (berevajî) b- Bi Kurmanciya Xwarê "gelo". 5: a- Tabûtan li ser dîbin goristanê, yan li ciyên ku erebe nebin, ji daran "doşekkekê" çedîkin û nexweşan li ser dîbin nexweşanan. b- Di zimanê Kurdî de pronavek. 6: a- Baxê bi nav û deng ê çirokan b- Rêxistinek e ku hinek mirovên bawetê ji bo misilmanan

(berevajî) b- Li devera Zaxo ji bo xorten 14, 15, 16 salî, xortê nu digihin û hîn ne zewicî ne, tê gotin (berevajî).

SEREJÊR: 1: a- Navê destaneke bi nav û deng a Kurdî b- Bi Kurmanciya Xwarê "Zevî" 2: a- Navê stranbêjekî Ermenî ku gelek stranen bi Kurdi jî gotine û dibêje. b- Teyare, firoke (berevajî) 3: a- Hîn, hê jî, Hêsta b- Zarok (berevajî) c- Hêkên masiyan, hêkên beqan. 4: a- Li devera Zaxo ji bo berazên mê tê gotin (berevajî) b- Ciye ku xelk pişti mirinê lê têne veşartîn, tîrb, qebir. (berevajî)

5: a- Aleteke kolandinê b- pronavek c- Dengê kúçikan. 6: a- Li başûrê Iraqê bajarekî mezin. (berevajî) b- Pê, li hinek ciyan: "mil" (berevajî) c- Li Kurdistanê başûr çemekî mezin. 7: a- Du herfîn dengdar. b- Roj. c- Xwendina herfeke bêdeng. 8: a- Pêxwarinek ji şir çedîkin b- Pirt, "qisim", qetek (berevajî) 9: a- Di Kurdî de baneşanek (berevajî) b- Perçê biçûk (berevajî) c- Navê ciyekî ji laşê mirov. 10: a- Paşnavê serokê dewletê li Arnawutluk. b- Beyraq, elem. c- İşareta navnetewî ya desavê, tuwalêtê. 11: a- Muahede (berevajî) b- Nexweşiyek 12: a- Navê rojekê b- pronavek c- Çiçikên pîrejinan, çiçikên ku pir şor bûne, hatine xwar.

Vê serkeftina gelê Kurd, Saddam û rejima wî ya dest-bîxwîn har kir. Bi qewetek eskeri ya gelek mezin, ji hewa û ji reşayê bi balafîren herbê, bi helikopter, bi fuzyen scud- li gor beyaneke Cepha Kurdistanê di rojekê de 11 fuzyen scud avetin Kerkükê- û çekênen giran ên din, êrişke gelek berfireh birin ser Kurdistanê. Hêzên pêşmergan heta dawîya Adarê bi qehremanî şer kirin, hemû bajar û herêmîn di desten xwe de parastin. Di warê eskerî de ziraren mezin dan dijmin û bi dehhezran esker dîl girtin.

Li aliye din, ji ber ku nehiştin milet sinor derbas bikin û yên derbas bûne jî nehiştin ji serê ciyan dakevin des-tê, loma jî bûn sebebê mirina bi sedan zarakan. Bi rojan milet li serê ciyan di nav sermê, berf û baranê de hîştin, ne sitarek ji wan re çekirin û ne xwarin dan wan û ne jî hîştin ku gelê Kurd bi xwe alîkariya wan bike. Ji ber vê rîlibergirtina alîkariyê, li gor beyanen wan, teqrîben her roj 100-150 za-rok dimrin. Tevi zarok û mezinan rojê 500 kes dimrin. Her wisa li gor beyanen

Ji bo Kurdan Konser

Di 12'ê Gulanê de, li stadyuma bi nav û deng a Londrayê "Wembly"ê bi besdarbuna muzisyen û bi nav û deng, bi navê "Kurdan rizgar bikin" konserê wê bê çekirin. Di konsêre da wê Gloria Estefan, Elton John, Rod Stewart, Paul McCartney, Peter Gabriel, Chris de Burgh besdar bilbin. Hunermendê muzika "Rap"ê Mc Hammer ji ku nuha li Ewrûpayê konsêran dide qebûl kiriye ku di konserê de besdar bibe.

Bi riya satelitê hunermendê mezin yê muzika klasik Luciano

Pavarotti, Kirite Kanawa, Nigel Kennedy ji Parisê û ji Newyorkê tevi konserê dibin.

Yek ji amadekarê konserê hunermend Chris de Burgh got: "Min strana xwe ya bi navê rasitiya vekiri diyariya konsere kiriye. Em hemû dîbin şîrîkê  sa Kurdan ku nuha tê da ne. Ev ne faciayek hawirdori ye, ev ne birçibûna Etiyopyayê ye. Ev fe-laketek e ku bi temamî bi desten insana hatiye çekirin. Divê em hemû ji wê kîfa pişti şer, nuha şerm blîkin".

Kurd ne bi zikê birçî lê...

Destpêk r. 1

Di dawîya Sibatê de pişti 100 seetên şerê reşayî, ordiya Seddamala sipî kişand û teslim bû; şer di 26'ê Sibatê de rawestiyâ. Bi teslim-buna Iraqê re, li Başûr Şîryan li hember diktatoriya Saddam serî hildan. Di nav çend rojan de gelek bajar girtin û serkeftinê mezin bi dest xistin. Pişti serîhildana li başûr, li Kurdistanê gelê Kurd ji di destpêka Adarê de bi rengkî girseyî û jixwaber li seranserê Kurdistanê dest bi serîhildaneke tevayı kir. Di nav çend rojan de Kurdistan ji hêzên dijmin hat paqîkirin û kontrol ket destê gel. Cepha Kurdistanê, tavîlê seroktiya serîhildanê û idara siyasi û civakî girt destê xwe.

Di serîhildanê de bûyera herî balkêş û her wisa jî hê-jayî pesnê; yekîtiya milet bû. Ji bo rizgarkirina Kurdistanê milet hemû, bi baş û xerabê xwe ve, bi pêşverû û paşverû û xwe ve, bi pêşmerge û 'caşen' xwe ve li hember zîlm û zora netewî, li hember diktatoriya Saddam bûn yet laş, yet dil û serî hildan.

Azadiya kin

Vê serkeftina gelê Kurd, Saddam û rejima wî ya dest-bîxwîn har kir. Bi qewetek eskeri ya gelek mezin, ji hewa û ji reşayê bi balafîren herbê, bi helikopter, bi fuzyen scud- li gor beyaneke Cepha Kurdistanê di rojekê de 11 fuzyen scud avetin Kerkükê- û çekênen giran ên din, êrişke gelek berfireh birin ser Kurdistanê. Hêzên pêşmergan heta dawîya Adarê bi qehremanî şer kirin, hemû bajar û herêmîn di desten xwe de parastin. Di warê eskerî de ziraren mezin dan dijmin û bi dehhezran esker dîl girtin.

Li aliye din, ji ber ku nehiştin milet sinor derbas bikin û yên derbas bûne jî nehiştin ji serê ciyan dakevin des-tê, loma jî bûn sebebê mirina bi sedan zarakan. Bi rojan milet li serê ciyan di nav sermê, berf û baranê de hîştin, ne sitarek ji wan re çekirin û ne xwarin dan wan û ne jî hîştin ku gelê Kurd bi xwe alîkariya wan bike. Ji ber vê rîlibergirtina alîkariyê, li gor beyanen wan, teqrîben her roj 100-150 za-rok dimrin. Tevi zarok û mezinan rojê 500 kes dimrin. Her wisa li gor beyanen

Rêxistina Parastina Zarokan û Komela Doktorê Kurd, piraniya mirinê zarokan ji ber zikcûn(ishal) û bêxidatîtiyê ye. Ev muamela Tirkîyê ya neînsanî û êrişen li hember milet, gelek caran hatin ekranen telewîzyonê cihanê û bûn sebebê protestoyen gelek mezin. Heta Yekîtiya Ewrûpayê, Koma Netewan, Rêxistina Parastina Zarokan, Xaça Sor, Amerika, Almanya, Îngilîstan, Fransa û gelek rêxistin û welatên din bi milyonan dollar û bi helikopter û balafîran alîkari şandin, Tirkîyê tû alîkariyek nekir û nehişt milet ji serê ciyan dakevin deren bi sitar.

Li hember vê muamela Tirkîyê ya neînsanî, Îraniyan muameleyek, nermtir nîsan dan. Bi piranî sinorê xwe vekirî hîştin û li gor imkanen xwe alîkari kirin. Li gel ku hejmara kesen derbasî alî Iranê bûne, ji hejmara yê derbasî alî Tirkîyê bûne, gelekî zêdetir in. Li gor hejmaraen Îranî didin li dora milyonek û sedhezar kesî derbasî Îranê bûne. Lî li vir rewş ji Tirkîyê gelekî xerabtir e. Li gor rapora dawî (26 Nisan) ya Netewen Yekbûyi rojê 2000 kes dimrin û heger alîkariyek bi serûber negihîje wan, wê "trajediya Kurdan biçede".

Bi kurtayî heta dawîya Nisanê ci li Tirkîyê û ci ji İranê bi tevayî rewşa multeciyan û bi taybetî jî rewşa zarokan gelek xirab bû. Pişti ku Amerika û mutefikan ji bo organizekirina alîkariyê esker şandin Kurdistanê Iraqê û Tirkîyê, hêdî hêdî rewş ber bi başiyê diçê.

Ser berdewam e

Erê nêzî 2 milyon Kurdan Kurdistan terk kirin û gel zirar û zayatek mezin da, lê şerê pêşmergan bi rengkî berfireh berdewam e. Berpirsiyarê Yekîtiya Nişîmanî Kurdistan, di 16'ê Nisanê de got ku hêzên pêşmergan li nêzî Sulêmaniyê qerargehek eskeri girtine. "Pişti şerekî kin hêzên Yekîtiyê qerergeha 38'an bi 3000-2500 eskeri girtin." Li herêmîn din ji şerê çekdarî berdewam e.

Zinarê Xamo

Hukumeta Tirk termîneke nuh xist
nav lîteratura huqûqa navnetewî

“Efûya bi şert”

□□ Li gor efûya bi şert xalên 140, 141, 142 û 163 yên Qanûna Cezayên Tirk radibin û kesên ku ji van xalan di hefsê de ne û yan ji ji van xalan têñ mahkemekirin bi otomatikî dikevin ber efûyê. Serokê kevin yê Belediya Diyarbekirê Mehdî Zana û M. Şêxmûs Cibran hatin berdan.

□□ Efûya bi şert, bi qanûna nuh ya terorê ve hat girêdan. Ev qanûn cezayên gelek giran tîne.

□□ Ji aliyê din Qanûna 2932 ku zimanê Kurdî qedexe kiribû, hat rakirin.

Di van 6-7 salên dawiyê de, di raya giştî ya Tirkîyê de ci ji aliyê hukumetê û partiyêñ muxalefetê ve ci ji ji aliyê komelêñ mafêñ mirovayî û dezgeyên din ve li ser efûyeke giştî dihat axaftin û muneqeşekirin. Di dawiyê de hukumeta Akbulut li ser pêşniyara Serokkomar Ozal, di 12'ê Nisanê de termîneke nuh xist nav huqûqa navnetewî û bi navê “efûya bi şert” qanûneke derxist, ev qanûn bi qanûna nuh ya terorê ve girê da û Meclisa Mezin a Tirkîyê qanûn qebûl kir. Kesên ku heta 8'ê Nisanâ 1991'an ceza xwarine, dikevin ber vê efûya bi şert.

Li gor vê efûya bi şert Xalêñ Qanûna Cezayên Tirk yên 140, 141, 142 û 163 radibin. Kesên ku ji van xalan di hefsan de bûn, yan ji ji van xalan dihañ mahkemekirin hermû ji otomatik ketin ber efûyê. Di xalêñ din de ji súcen li diji dewletê; cezayên idamê daket 20 salan, cezayên muebedê daket 15 salan û cezayên din ji ji 5/1 dadikevin (yanî yekî 10 sal ceza xwaribe, wê du salan di hefsê de bimîne). Di cezayên súcen “adî” de ji cezayê idamê daket 10 salan, cezayên muebedê ji dadikevin 8 salan.

Li gor pressa Tirkîyê 46 hezar mahkûmân di hefsan de dikevin ber efûyê. Di nav van mahkûman de 20 rojnamevan, yan ji berpirsiyaren kovaran ku 600-700 salî cezayê hefsê stendibûn, hene. Kesên sextekar, bazirganêñ silehan, terroristên “heqîqî” dikevin ber efûyê, lê cezayên ji endame-

tiya rôexistinêñ siyasi ên Tirkan wek DEV-YOL û DEV-SOL li dervayî efûyê man. Ji ber ku xalêñ 125 û 146 nakevin ber efûyê.

Piştî ku qanûna efûyê ket jîyanê, gelek kes ji hefsan hatin berdan. Di nav van kesan de Serokê kevin yê Belediya Diyarbekirê Mehdî Zana û M. Şêxmûs Cibran (kadroyekî PPKK) jî hene.

Yen ku ji hemwelatiya (vatanداşıya) Tirkîyê hatine avêtin heta du salan lazim e vegeerin Tirkîyê. Ku ew di vê wextê de venegerin wê nekevin ber efûyê. Ji kesên din re wextek nehatiye dest nişan kirin. Kenge ew bixwazin dikarin vegeerin welêt û wê efû ji wan bigre.

Hukumet bi qanûna efûya bi şert re qanûna terorê ji derxist. Ü ji terorê re ji naverokeke nuh peyda kir. Li gor vê, Xalêñ Cezayên Qanûna Tirk yên 125, 131, 146, 147, 148, 149, 156, 168, 171 û 172 dikevin nav súcen terorê. Yanî li gor vê, rôexistinêñ Kurdan û endamên wan tev dibin “terorist”. Bi tevayî di vê qanûna nuh de gelek ceza hene ku ji yên berê gelek girantir in. Wek numûne; kesê ku propaganda “cûdaxwaziye” bike, wê di navbera 2 sal û 5 salan de cezayê hefsê bixwe û 50-100 milyon Lîre cezayê pere bide. Heger propaganda bi wasita presse bê kirin, wê herî hindik 100 milyon cezayê pere bide.

Ji aliyê din qanûna 2932 ya ku zimanê Kurdî qedexe kiribû, ji navê rabû.

□

Alîkariya welatan a ji bo penaberêñ Kurd

□ Amerika, Belçika, Danîmarka, Fransa, Almanya, İngilîstan û gelekkwelatêñ din xwarin, çadir û ilac ji Kurdan re şandin.

□ Kurden Kurdistanâ ïranê, Tirkîye û Sûriyê qût û kincen xwe, malen xwe bi hemwelatiyêñ xwe yên maxdûr ve par dikan.

□ Li gelekkwelatêñ kilise, rôexistinêñ humanîter pere, kinc, derman ji bo Kurden ku ji ber zulma Seddam reviyane, dicivînin.



Piştî êrîşen Seddamê xwînxwar, li dor 2 milyon Kurd bi hewla xelaskirina canê xwe, cî, war û malen xwe terk kirin, berê xwe dan hudûdê Kurdistanâ ïranê û Tirkîyê. Ji birçina, ji sermayê, ji westanê her roj bi hezaran kes dimrin. Li gor agahdariyê rôexistinêñ humanîter, heger alîkariyek bi lez û têr negihîje herêmê wê hejmara miriyan rojê bigihîje deh hezaran.

Li ser vê feleketa ku emsalê wê tu carî li ser rûyê vê dinê nehatiyejiyin, beriya her kesî û ji her kesî pirtir gelê Kurde xizan, ê Kurdistanâ Tirkîyê, ïranê û Sûriyê desten xwe dirêji birayen xwe kirin.

Li Kurdistanâ ïranê Kurdan xaniyên xwe, malen xwe ji birayen xwe re pêşkêş kirin. Li Kurdistanâ Sûriyê xelkê me, heta ku sînorê Iraqê di desît pêşmergan de bû, 24 seet bi kelekan arvan, erzaq ji birayen xwe re dişandin. Li Kurdistanâ Tirkîyê li her bajarî, li her taxê ji bo organizekirin û civandina alîkariyê bi dehan komîte hatin avakirin. Bi hezaran ton kinc, derman, xwarin, arvan, çadir, bataniye hatin civandin. Li gor nûçeya muxabîra me ya Diyarbekirê, gund heye kamyonek, du kamyon eşya lê tê civandin. Li gor muxabîra me yê Stenbolê, hewqas alîkari hatiye civandin ku heta mehekê neqliyata wan ne mumkun e.

Kurden li Ewrûpayê, yên li der-

veyî welêt dijîn jî bi xwe an jî li gel xelkêñ wan welatêñ ku lê ne, komîte ava kirin û bi hemû imkanen xwe ve alîkari civandin. Her wisa li gelek welatan, kîlîsan, rôexistinêñ humanîter, Xaça Sor, Rôexistinê Parastina Zarokan, radyo, televizyon, rojname û hwd ji bo alîkariya Kurdan kampanya vekirin. Ü hîn jî kampanyan wan dom dikan. Xaça Sor a Swêdê da diyarkirin ku tu carî wek vê kampanya Kurdan alîkari li Swêd nehatiye civandin. Hemû depoyen Xaça Sor ji cilîn hatine civandin tije bûne.

Alîkariya Dewletan

Belçikayê 1.8 milyon Kronen Swêd û ji bo neqliyata tiştan, teyarek eskerî amade kirin. İngilîstanê 220.7 milyon Kron, 23.000 bataniye, 750 çadir û ji bo belavkirin û neqliyata eşya û xwarinê helikopter Chinook şandin herêmê. Hukûmeta İngilîstanê her wisa leşkeren xwe ji bo bicikirin û parastina penaberan, şandin herêmê. Danîmarkayê 9 milyon, Norwecê 9,6 milyon, Swêd 100 milyon kron, Finlandiyayê 21 milyon kron alîkari şand. İspanyayê 6 milyon kron û tevî 2 teyarek transportê, Hollandalayê 72 milyon kron, Koreya Başûr 1,8 milyon kron, İswîçre bi qasî buhayîya 12 milyon kron 5.500 ton eşyayen xwarinê, Yunanîstanê ji teyarek dermanen tibbi, Bulgarîstanê bi qasî qîmetâ

milyonek Leva çadir, Sovyetê 60 ton xwarin, İsrail ji 9 ton eşya alîkari şandin.

Civaka Ewrûpayê ji biryara şandina 1,1 milyar Kronen Swêdî stend. Japonyayê 65 milyon kron wek alîkari û ji bo alîkariya ten-duristî ji 16 doktor û hemşire şandin herêmê. Almanya Federal yek ji wan dewletan e ku pirtirin alîkari şandiye. Almanyayê 100 ton çadir, livîn û ilac şand. Rojîn pêşî bi qîmeta 60 milyonî ji bo tişten pêwist şand û dû re ji biryara 1.5 milyar kron alîkariyê stend. Almanyayê ji bo alîkariyê teyarek xwe yê neqliyatê û helikopter ji şandin. Ji hêla alîkariya insanî ve Fransayê ji wek Almanyayê alîkariyek mezin şand herêmê. Gelek doktor û personel tibbi li herêmê kar dikan. Hêzên mutefikan li dor 300 ton çadir, bataniye û derman bi paraşütan ji hewa berdan Kurdistanâ Iraqê û sînorê Tirkîyê. Li dor 1000 ton eşya ji şandin hudûdê Kurdistanâ Iran û Iraqê. Fransa her wisa wê li dor 1000 eskeren xwe ji ji bo parastina xelkê ji bajar û gundê xwe derketeine ciya û xwe li hudadan xistine, bişne.

Amerika 600.000 bataniye, 2.800 çadir, 800.000 çakêtên eskerî şandine. Ji bo alîkari û parastina xelkê ji li dor 16.000 eskerî şandine. Amerika her diçe alîkariya ku dide penaberan zêdetir dike.

Adres, telefon û telefaksa me hat guhertin

Adresa me ya nuh ev e:

Armanc

Box: 152 16

161 15 Bromma/ SWEDEN

Telefon: 46 -8- 803135

Telefaks: 46- 8- 801825